

*Bi Kurdî – Bi Almanî
Kurdisch – Deutsch*

MIZGÎNÎ LI GOR YÛHENA

EVANGELIUM NACH JOHANNES

Johannesevangelium deutsch / kurdisch (VPE = 20 Exemplare)

Taschenbuch, 160 Seiten
Format: 11 x 18 cm
Artikel-Nr.: 256021
ISBN / EAN: 978-3-86699-021-0

Johannesevangelium deutsch / kurdisch
(Kurmandschi-Dialekt).
Bitte beachten Sie, dass dieser Artikel
(Verteilbuch) nicht weiterverkauft werden darf!
Die Mindestabnahme beträgt 20 Exemplare.

Wenn Sie ein "echtes" Buch bevorzugen oder
diesen Artikel verschenken möchten, können Sie
diesen Download-Artikel ggf. auch käuflich
erwerben, solange verfügbar.

[Artikel ansehen auf clv.de](http://clv.de)

**MIZGÎNÎ LI GOR
YÛHENA**

EVANGELIUM NACH JOHANNES

**Bi Kurdî – Bi Almanî
Kurdisch – Deutsch**

Das Wort wurde Fleisch

- 1** Im Anfang war das Wort, und das Wort war bei Gott, und das Wort war Gott.
- 2** Dieses war im Anfang bei Gott.
- 3** Alles ist durch dasselbe entstanden; und ohne dasselbe ist auch nicht eines entstanden, was entstanden ist.
- 4** In ihm war das Leben, und das Leben war das Licht der Menschen.
- 5** Und das Licht leuchtet in der Finsternis, und die Finsternis hat es nicht begriffen.
- 6** Es war ein Mensch, von Gott gesandt; sein Name war Johannes.
- 7** Dieser kam zum Zeugnis, um von dem Licht Zeugnis zu geben, damit alle durch ihn glaubten.

- 8** Nicht er war das Licht, sondern er sollte Zeugnis geben von dem Licht.
- 9** Das wahre Licht, welches jeden Menschen erleuchtet, sollte in die Welt kommen.
- 10** Er war in der Welt, und die Welt ist durch ihn geworden, doch die Welt erkannte ihn nicht.
- 11** Er kam in sein Eigentum, und die Seinen nahmen ihn nicht auf.
- 12** Allen aber, die ihn aufnahmen, denen gab er das Anrecht, Kinder Gottes zu werden, denen, die an seinen Namen glauben;
- 13** die nicht aus dem Blut, noch aus dem Willen des Fleisches, noch aus dem Willen des Mannes, sondern aus Gott geboren sind.
- 14** Und das Wort wurde Fleisch und wohnte unter uns; und wir sahen seine Herrlichkeit, eine Herrlichkeit als des Eingeborenen vom Vater, voller Gnade und Wahrheit.

Gotina bêpêşî

1 Di destpêkê de Gotin hebû û Gotin bi Xwedê re bû û Gotin Xwedê bû.

2 Ew, di destpêkê de bi Xwedê re bû.

3 Her tişt bi wî re çêbûn û ji tiştên ku bûyîne tu tişt bêyî wî nebûn.

4 Jiyan di wî de bû û jiyan ronahiya mirovan bû.

5 Ronahî di tariyê de ronî dike û tariyê wê fêhm nekir.

6 Zilamekî ku ji aliyê Xwedê ve hatibû şandin derket holê, navê wî Yehya bû.

7 Ew ji bona şahdeyiyê hat, da ku, ew ji ronahiyê re şahdeyiyê bike ku hemû mirov bi navgîniya wî bawer bikin.

8 Ew bi xwe ne ronahî bû, lê bona ku ji ronahiyê re şahdeyiyê bike hat.

9 Ronahiya rasteqîn, ya ku hemû mirovan ronahî dike, dihat dinê, hebû.

10 Ew li dinê bû û dinê bi navgîniya wî hate afirandin, lê belê dinê wî nas nekir.

11 Ew ji yên xwe re hat, lê belê yên wî, ew qebûl nekirin.

12 Lê belê wî rayedariya bûyîna zarokên Xwedê da hemûyên ku wî qebûl kirine û bi navê wî ve bawerî anîne.

13 Ew kes ne ji xwînê, ne ji xwestina bedenê û ne jî bi daxwaza mirov; lê ji Xwedê ve bûn.

14 Û Gotin bû beden û bi xêr û rasteqîniyê ve tijî, di nav me de jiya; me jî bilindahiya wî, wekî bilindahiya Lawê tekane yê Bav e, dîtîn.

Das Zeugnis Johannes' des Täufers von Jesus Christus

15 Johannes legte Zeugnis ab von ihm, rief und sprach: Dieser war es, von dem ich sagte: Der nach mir kommt, ist vor mir gewesen, denn er war eher als ich.

16 Und aus seiner Fülle haben wir alle empfangen Gnade um Gnade.

17 Denn das Gesetz wurde durch Mose gegeben; die Gnade und die Wahrheit ist durch Jesus Christus geworden.

18 Niemand hat Gott je gesehen; der eingeborene Sohn, der im Schoß des Vaters ist, der hat Aufschluss [über ihn] gegeben.

19 Und dies ist das Zeugnis des Johannes, als die Juden von Jerusalem Priester und Leviten sandten, um ihn zu fragen: Wer bist du?

20 Und er bekannte es und leugnete nicht, sondern bekannte: Ich bin nicht der Christus!

21 Und sie fragten ihn: Was denn? Bist du Elia? Und er sprach: Ich bin's nicht! Bist du der Prophet? Und er antwortete: Nein!

22 Nun sprachen sie zu ihm: Wer bist du denn? Damit wir denen Antwort geben, die uns gesandt haben: Was sagst du über dich selbst?

23 Er sprach: Ich bin »die Stimme eines Rufenden, [die ertönt] in der Wüste: Ebnet den Weg des Herrn!«, wie der Prophet Jesaja gesagt hat.

24 Die Gesandten gehörten aber zu den Pharisäern.

25 Und sie fragten ihn und sprachen zu ihm: Warum taufst du denn, wenn du nicht der Christus bist, noch Elia, noch der Prophet?

26 Johannes antwortete ihnen und sprach: Ich taufe mit Wasser; aber mitten unter euch steht einer, den ihr nicht kennt;

Şahdeyiya Yehya ya yekemîn:

Ew di nav me de disekine

15 Yehya bona wî şahdeyiyê kir, bang kir û got: Yê ku ji we re digotim: Yê ku li pey min tê di ser min re ye; ji ber ku ew berî min hebû; ev e.

16 Û me hemûyan ji tijîbûna wî, dilovanî li ser dilovanîyê girtin.

17 Ji ber ku zagon bi destê Mûsa ve hate dayîn, lê belê dilovanî û rastî bi destê Îsa Mesîh ve hatin.

18 Tu carî, tu kesî Xwedê nedîtîye; Lawê tekane, yê ku di himbêza Bav de ye, wî bi xwe ew da bang kirin.

19 Dema Cihûdan ji Orşelîmê kahîn û Lêwî şandin ku, ji Yehya bipirsîn: Tu kî yî? Şahdeyiya Yehya ew e.

20 Û wî ser tiştêkî nenuxumand û bi eşkereyî got: Ez ne Mesîh im!

21 Wan jî jê pirsîn: Wê çaxê tu kî yî? Ma tu Êlyas î? Û Yehya got: Ne ez im! Ji pirsra: Ma tu ew Peyxamber î? Yehya bi gotina: Na! bersivê da.

22 Niha, wan jê re gotin: Ma tu kî yî? Bona em bersivê bidin yên ku me şandine: Ma tu ji bo xwe çi dibêjî?

23 Wî bi gotina daxuyanî kirina Yeşaya peyxamber bersiv da wan: Ez dengê ku bi gotina: Rêya Xudan rast bikin! ji çolê ve bang dika me.

24 Kesên hatibûn şandin, ji Fêrisîyan bûn.

25 Û wan ji Yehya pirsîn û jê re gotin: Madem ku tu ne Mesîh î, ne Êlyas î û ne jî ew Peyxamber î, ma çima tu vaftîzê dikî?

26 Yehya bersiv da wan û got: Ez bi avê vaftîz dikim, lê belê di nav we de yekî din ku hûn wî nas nakin heye;

27 dieser ist's, der nach mir kommt, der vor mir gewesen ist; und ich bin nicht würdig, ihm den Schuhriemen zu lösen.

28 Dies geschah in Bethabara, jenseits des Jordan, wo Johannes taufte.

Das Lamm Gottes

29 Am folgenden Tag sieht Johannes Jesus auf sich zukommen und spricht: Siehe, das Lamm Gottes, das die Sünde der Welt hinwegnimmt!

30 Das ist der, von dem ich sagte: Nach mir kommt ein Mann, der vor mir gewesen ist; denn er war eher als ich.

31 Und ich kannte ihn nicht; aber damit er Israel offenbar würde, darum bin ich gekommen, mit Wasser zu taufen.

32 Und Johannes bezeugte und sprach: Ich sah den Geist wie eine Taube vom Himmel herabsteigen, und er blieb auf ihm.

33 Und ich kannte ihn nicht; aber der mich sandte, mit Wasser zu taufen, der sprach zu mir: Der, auf den du den Geist herabsteigen und auf ihm bleiben siehst, der ist's, der mit Heiligem Geist tauft.

34 Und ich habe es gesehen und bezeuge, dass dieser der Sohn Gottes ist.

35 Am folgenden Tag stand Johannes wiederum da und zwei seiner Jünger.

36 Und indem er auf Jesus blickte, der vorüberging, sprach er: Siehe, das Lamm Gottes!

Die ersten Jünger

37 Und die beiden Jünger hörten ihn reden und folgten Jesus nach.

38 Als aber Jesus sich umwandte und sie nachfolgen sah,

27 yê ku li piştî min tê, ew e; ew berî min hebû û ez ne liyaq im ku bendê çarixê wî vekim.

28 Vana ji wêdetira Urdunê, li Beytanyayê, li cîhê ku Yehya vaftîzê dikir çêbûn.

Şahdeyiya Yehya ya duwemîn: A vay, Bêrxê Xwedê

29 Dotira rojê Yehya dît ku Îsa ber bi wî tê û wî got: A vay, Bêrxê Xwedê yê ku gunehên dinê radike!

30 Kesê ku ji bona wî gotibûm: Piştî min zilamekî ji min seretetir e tê, ji ber ku ew berî min hebû, ev e.

31 Û min bi wî nedizanîbû, lê belê bona ku ew ji Îsraêlê re bête gîhandin, ez hatim û bi avê vaftîz kirim.

32 Yehya şahdeyî kir û got: Min dît ku Ruh ji ezmanan mîna kevokekê hate xwar û li ser wî sekinî.

33 Û min bi wî nizanîbû; lê belê yê ku min, bona ez bi avê vaftîz bikim şandiye, bi xwe ji min re got: Ger tu bibîne Ruh bi ser kî ve dakeve û bisekine, yê ku bi Ruhê Pîroz vaftîz bike, ew e.

34 Min jî dît û şahdeyiyê kir û got, Lawê Xwedê ev e.

35 Dotira rojê Yehya dîsa tevî du şagirtên xwe disekinî

36 û gava ku Îsa digeriya, ew li wî nihêrt û got: A vay, Bêrxê Xwedê!

Şagirtên Îsa yên pêşiyê

37 Û dema ku wan herdu şagirtan gotina wî bihîstin, ew li pey Îsa çûn.

38 Îsa dema ku vegeriya, dît ku ew li pey wî tîn; wî ji

sprach er zu ihnen: Was sucht ihr? Sie sprachen zu ihm: Rabbi (das heißt übersetzt: »Lehrer«), wo wohnst du?

39 Er spricht zu ihnen: Kommt und seht! Sie kamen und sahen, wo er wohnte, und blieben jenen Tag bei ihm. Es war aber um die zehnte Stunde.

40 Andreas, der Bruder des Simon Petrus, war einer von den beiden, die es von Johannes gehört hatten und ihm nachgefolgt waren.

41 Dieser findet zuerst seinen Bruder Simon und spricht zu ihm: Wir haben den Messias gefunden (das heißt übersetzt: den »Gesalbten«).

42 Und er führte ihn zu Jesus. Jesus aber sah ihn an und sprach: Du bist Simon, Jonas Sohn, du sollst Kephas heißen (das heißt übersetzt: »ein Stein«).

43 Am folgenden Tag wollte Jesus nach Galiläa reisen; da findet er Philippus und spricht zu ihm: Folge mir nach!

44 Philippus aber war von Bethsaida, aus der Stadt des Andreas und Petrus.

45 Philippus findet den Nathanael und spricht zu ihm: Wir haben den gefunden, von welchem Mose im Gesetz und die Propheten geschrieben haben, Jesus, den Sohn Josephs, von Nazareth.

46 Und Nathanael sprach zu ihm: Kann aus Nazareth etwas Gutes kommen? Philippus spricht zu ihm: Komm und sieh!

47 Jesus sah den Nathanael auf sich zukommen und spricht von ihm: Siehe, wahrhaftig ein Israelit, in dem keine Falschheit ist!

48 Nathanael spricht zu ihm: Woher kennst du mich? Jesus antwortete und sprach zu ihm: Ehe dich Philippus rief, als du unter dem Feigenbaum warst, sah ich dich!

49 Nathanael antwortete und sprach zu ihm: Rabbi, du bist der Sohn Gottes, du bist der König von Israel!

wan re got: Hûn li çi digerin? Wan jî ji wî re gotin: Rebbî (ku wergera wê: Mamoste ye) tu li ku derê rûdini?

39 Wî ji wan re got: Werin û bibînin! Ew hatin û çihê ku Îsa lê rûdinişt dîtin û wê rojê li cem wî man. Saet wê çaxê deh bû.

40 Yek ji du kesên ku ji Yehya bihîstin û li pey Îsa çûn, Andréyasê birayê Şîmûn Pêtrûs bû.

41 Wî pêşiyê birayê xwe Şîmûn dît û jê re got: Me Mesîh (ku wergera wê: Yê ku hatiye mesh kirinê ye) dîtin.

42 Û wî ew bir cem Îsa. Îsa li wî nihêrt û got: Tu Şîmûnê lawê Yûhena yî; tuyê bi navê Kîfas (ku wergera wê: Pêtrûs e) ve bête bang kirin.

43 Dotira rojê, Îsa xweste ku here Celîlê; wî Fîlîpûs dît û ji wî re got: Li pey min were!

44 Fîlîpûs jî ji Beytsaydayê, ji bajarê Andréyas û Pêtrûs bû.

45 Fîlîpûs Natanyêl dît û jê re got: Me Îsayê Nisretiyê lawê Ûsiv, yê ku Mûsa di zagonê de û peyxamberan ji bona wî nivîsandine, dîtin.

46 Natanyêl jê re got: Ma ji bajarê Nisretê tiştekî qenc derdikeve? Fîlîpûs ji wî re got: Were û bibîne!

47 Îsa dît ku Natanyêl ber bi wî tê û di derheqê wî de got: A vay, Îsraêliyek rasteqîn, yê ku di dilê wî de fenekî nîne!

48 Natanyêl ji wî re got: Tu min ji ku nas dikî? Îsa bersiv da û jê re got: Berî ku Fîlîpûs bangî te bike, min te di bin dara hêjîrê de dîtibû!

49 Natanyêl bersiv da û ji wî re got: Mamoste, tu Lawê Xwedê yî, tu Qiralê Îsraêlê yî!

50 Jesus antwortete und sprach zu ihm: Du glaubst, weil ich dir sagte: Ich sah dich unter dem Feigenbaum? Du wirst Größeres sehen als das!

51 Und er spricht zu ihm: Wahrlich, wahrlich, ich sage euch: Künftig werdet ihr den Himmel offen sehen und die Engel Gottes auf- und niedersteigen auf den Sohn des Menschen!

Die Hochzeit von Kana

2 Und am dritten Tag war eine Hochzeit in Kana in Galiläa, und die Mutter Jesu war dort.

2 Aber auch Jesus wurde samt seinen Jüngern zur Hochzeit eingeladen.

3 Und als es an Wein mangelte, spricht die Mutter Jesu zu ihm: Sie haben keinen Wein!

4 Jesus spricht zu ihr: Frau, was habe ich mit dir zu tun? Meine Stunde ist noch nicht gekommen!

5 Seine Mutter spricht zu den Dienern: Was er euch sagt, das tut!

6 Es waren aber dort sechs steinerne Wasserkrüge, nach der Reinigungssitte der Juden, von denen jeder zwei oder drei Eimer fasste.

7 Jesus spricht zu ihnen: Füllt die Krüge mit Wasser! Und sie füllten sie bis obenhin.

8 Und er spricht zu ihnen: Schöpft nun und bringt es dem Speisemeister! Und sie brachten es hin.

9 Als aber der Speisemeister das Wasser, das zu Wein geworden war, gekostet hatte (und er wusste nicht, woher es war; die Diener aber, die das Wasser geschöpft hatten, wussten es), da rief der Speisemeister den Bräutigam

10 und sprach zu ihm: Jedermann setzt zuerst den guten Wein vor, und dann, wenn sie trunken geworden sind, den geringeren; du aber hast den guten Wein bis jetzt behalten!

50 Îsa bersiv da û ji wî re got: Ji ber ku min ji te re got: Te di bin dara hêjîrê de dîtîm, tu bawer dikî? Tuyê tiştên ji vê hîn jî mezintir bibîn!

51 Û jê re got: Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Hûn ê vekirina ezmanan û milyaketên Xwedê, bi ser Lawê Mirov ve bilind dibin û têne xwarê; bibînin!

Nîşana pêşiyê

2 Û roja sisiyan li Kanaya Celîlê dawetek hebû û dayika Îsa jî li wê derê bû.

2 Îsa û şagirtên xwe jî hatibûn dawet kirin.

3 Û dema xemr kêmbû, dayika Îsa jê re got: Xemra wan nîne!

4 Îsa ji wê re got: Pîrek, ma te çi ji min e? Dema min hîn nehatiye!

5 Dayika wî, ji xizmetkaran re got: Ew ji we re çi bêje, wê bikin!

6 Li wê derê ji bo kevneşopên paqijiyê ya Cihûdan, şeş kûpên kevirî hebûn ku di her kûpekê de du an jî sê metrît av bi cih dibû.

7 Îsa ji xizmetkaran re got: Kûpan bi avê tijî bikin! Û wan heta ber dêv tijî kirin.

8 Û wî ji wan re got: Niha derxinin û ji serokê şahiyê re bibin! Û wan jî birin.

9 Gava serokê şahiyê ew ava ku bûbû xemr tam kir, wî nizanîbû ku ew ji ku hatiye, (lê belê xizmetkarên ku av ji kûpê ve derxistibûn, dizanîbûn); serokê şahiyê bangî zava kir û got:

10 Her kes pêşiyê xemra qenc û paşî ku zehf vexwarin, ya ne qenc dide; lê belê te xemra qenc heta niha veşartiyê!

11 Diesen Anfang der Zeichen machte Jesus in Kana in Galiläa und ließ seine Herrlichkeit offenbar werden, und seine Jünger glaubten an ihn.

12 Danach zog er hinab nach Kapernaum, er und seine Mutter und seine Brüder und seine Jünger, und sie blieben wenige Tage dort.

Die erste Tempelreinigung

13 Und das Passah der Juden war nahe, und Jesus zog hinauf nach Jerusalem.

14 Und er fand im Tempel die Verkäufer von Rindern und Schafen und Tauben und die Wechsler, die dasaßen.

15 Und er machte eine Geißel aus Stricken und trieb sie alle zum Tempel hinaus, samt den Schafen und Rindern, und den Wechslern verschüttete er das Geld und stieß die Tische um;

16 und zu den Taubenverkäufern sprach er: Schafft das weg von hier! Macht nicht das Haus meines Vaters zu einem Kaufhaus!

17 Seine Jünger dachten aber daran, dass geschrieben steht: »Der Eifer um dein Haus hat mich verzehrt«.

18 Da antworteten die Juden und sprachen zu ihm: Was für ein Zeichen zeigst du uns, dass du dies tun darfst?

19 Jesus antwortete und sprach zu ihnen: Brecht diesen Tempel ab, und in drei Tagen will ich ihn aufrichten!

20 Da sprachen die Juden: In 46 Jahren ist dieser Tempel erbaut worden, und du willst ihn in drei Tagen aufrichten?

21 Er aber redete von dem Tempel seines Leibes.

11 Îsa ev nîşana xwe ya pêşiyê, li Kanaya Celîlê çêkir û qudreta xwe nîşan da û şagirtên wî jî bawerî bi wî anîn.

12 Paşî vêya Îsa û dayika wî û birayên wî û şagirtên wî bi hev re daketin Kefernahûmê û ew gellek rojan li wê derê neman.

Îsa Perestgehê paqij dike

13 Û Fisiha Cihûdan nêzîk bû; Îsa jî hilkişiya Orşelîmê.

14 Di Perestgehê de firotkerên dewar, mîh û kevo-kan û yên ku pere hûr dikirin pev re rûniştî dîtin.

15 Û wî ji bendikan qamçiyek çêkir, hemû tev dewar û mîhên wan ji wir avêt derve, pereyê kesên ku pere hûr dikirin, rijand û maseyên wan gêr kir

16 û wî ji yên ku kevokan difirotin re got: Vana ji vê derê rakin, mala Bavê min nekin mîna cîhê bazarê!

17 Şagirtên wî, ew yeka ku hatiye nivîsandin anîn bîra xwe: Xîreta ku min ji bo mala te kir, dê min bixwe.

18 Wê demê Cihûdan bersiv dan û ji wî re gotin: Ma tuyê di derheqê rastiya van karên ku te kirine de, çi elametê nîşanî me bidî?

19 Îsa bersiv da û ji wan re got: Vê Perestgehê xera bikin, ez ê wê di sê rojan de rakim!

20 Wê demê Cihûdan gotin: Ev Perestgeh di çel û şeş salî de hatiye avakirin, ma tuyê vêya di sê rojan de rakî?

21 Lê belê Îsa qala Perestgeha bedena xwe dikir.

22 Als er nun aus den Toten auferstanden war, dachten seine Jünger daran, dass er ihnen dies gesagt hatte, und sie glaubten der Schrift und dem Wort, das Jesus gesprochen hatte.

23 Als er aber am Passahfest in Jerusalem war, glaubten viele an seinen Namen, weil sie seine Zeichen sahen, die er tat.

24 Jesus selbst aber vertraute sich ihnen nicht an, weil er alle kannte,

25 und weil er es nicht nötig hatte, dass jemand von dem Menschen Zeugnis gab; denn er wusste selbst, was im Menschen war.

Jesus und Nikodemus. Die Notwendigkeit der Wiedergeburt

3 Es war aber ein Mensch unter den Pharisäern namens Nikodemus, ein Oberster der Juden.

2 Der kam bei Nacht zu Jesus und sprach zu ihm: Rabbi, wir wissen, dass du ein Lehrer bist, der von Gott gekommen ist; denn niemand kann diese Zeichen tun, die du tust, es sei denn, dass Gott mit ihm ist.

3 Jesus antwortete und sprach zu ihm: Wahrlich, wahrlich, ich sage dir: Wenn jemand nicht von Neuem geboren wird, so kann er das Reich Gottes nicht sehen!

4 Nikodemus spricht zu ihm: Wie kann ein Mensch geboren werden, wenn er alt ist? Er kann doch nicht zum zweiten Mal in den Schoß seiner Mutter eingehen und geboren werden?

5 Jesus antwortete: Wahrlich, wahrlich, ich sage dir: Wenn jemand nicht aus Wasser und Geist geboren wird, so kann er nicht in das Reich Gottes eingehen!

6 Was aus dem Fleisch geboren ist, das ist Fleisch, und was aus dem Geist geboren ist, das ist Geist.

22 Dema ew ji mirinê rabû, şagirtên wî vê gotina anîn bîra xwe û baweriyê bi gotina Îsa û bi Nivîsên Pîroz anîn.

23 Û gava ew di Cejna Fisihê de li Orşelîmê bû, gellek kesên ku ev nîşanên ku wî kirine dîtîn û bawerî bi navê wî anîn.

24 Lê belê Îsa, bi wan bawer nedikir; ji ber ku wî hemûyê mirovan nas dikir.

25 Ji ber ku bona mirov hewcedariya wî qet ji şahdeyiya tu kesî re tunebû; ji ber ku wî bi xwe, bi tiştê di mirov de bû dizanîbû.

Îsa û Nikodêmûs. Mirov çawa dikare dîsa biwelide?

3 Di nav Fêrisiyan de, zilamek bi navê Nîkodêmûs hebû ku rêberekî Cihûdan bû.

2 Ev zilama bi şev hate cem Îsa û ji wî re got: Rebbî, em dizanin ku tu mamosteyekî ji Xwedê ve hatiye yî; ji ber ku ger Xwedê ne bi wî re be, qet kesek nikare van mûcîzetên ku tu çêdikî, bike.

3 Îsa bersiv da û ji wî re got: Bi rastî û bi rastî ez ji te re dibêjim: Heta ku mirovek ji nû ve newelide, nikare Serweriya Xwedê bibîne!

4 Nîkodêmûs jê re got: Ger mirov kal be, çawa dikare biwelide? Ma dikare ku cara duwemîn bikeve rehma dayika xwe û biwelide?

5 Îsa bersiv da: Bi rastî û bi rastî ez ji te re dibêjim: Heta ku mirovek ji avê û ji ruh ve newelide, nikare bikeve Serweriya Xwedê!

6 Yê ku ji bedenê welidiye beden e û yê ku ji Ruh ve welidiye Ruh e.

7 Wundere dich nicht, dass ich dir gesagt habe: Ihr müsst von Neuem geboren werden!

8 Der Wind weht, wo er will, und du hörst sein Sausen; aber du weißt nicht, woher er kommt und wohin er geht. So ist jeder, der aus dem Geist geboren ist.

9 Nikodemus antwortete und sprach zu ihm: Wie kann das geschehen?

10 Jesus erwiderte und sprach zu ihm: Du bist der Lehrer Israels und verstehst das nicht?

11 Wahrlich, wahrlich, ich sage dir: Wir reden, was wir wissen, und wir bezeugen, was wir gesehen haben; und doch nehmt ihr unser Zeugnis nicht an.

12 Glaubt ihr nicht, wenn ich euch von irdischen Dingen sage, wie werdet ihr glauben, wenn ich euch von den himmlischen Dingen sagen werde?

13 Und niemand ist hinaufgestiegen in den Himmel, außer dem, der aus dem Himmel herabgestiegen ist, der Sohn des Menschen, der im Himmel ist.

Der Sohn Gottes ist als Retter in die Welt gekommen

14 Und wie Mose in der Wüste die Schlange erhöhte, so muss der Sohn des Menschen erhöht werden,

15 damit jeder, der an ihn glaubt, nicht verlorengelt, sondern ewiges Leben hat.

16 Denn so [sehr] hat Gott die Welt geliebt, dass er seinen eingeborenen Sohn gab, damit jeder, der an ihn glaubt, nicht verlorengelt, sondern ewiges Leben hat.

17 Denn Gott hat seinen Sohn nicht in die Welt gesandt, damit er die Welt richte, sondern damit die Welt durch ihn gerettet werde.

18 Wer an ihn glaubt, wird nicht gerichtet; wer aber nicht glaubt, der ist schon gerichtet, weil er nicht an

7 Şaş nebe ku, min ji te re got: Hûn divê ji nû ve biwelidîn!

8 Ba ji kîjan alî ve bixwaze ûsa tê; tu dengê wê dibihîzî, lê belê ji ku ve tê û diçe ku derê, tu wê nizanî; her kesê ku ji Ruh welidîne jî ûsa ne.

9 Nîkodêmûs bersiv da û ji wî re got: Vana çawa dikarin çêbibin?

10 Îsa bersiv da û ji wî re got: Tu mamosteyê Îsraêlê yî û dîsa jî vana fêhm nakî?

11 Bi rastî û bi rastî ez ji te re dibêjim: Em tiştê ku dizanin dibêjin û ji tiştê ku me dîtine re şahdeyiyê dikin û hûn şahdeyîya me qebûl nakin.

12 Dema ku min ji we re qala tiştê dinê kir we bawerî nekir, wê çaxê ger ez qala tiştê ezmanî bikim hûn ê çawa bawer bikin?

13 Tu kes hilnekişiyaye ezman; tenê Lawê Mirov yê ku ji ezman hatiye xwar hilkişiyaye; ew ku, li ezmanê ye.

Îsa Mesîh, Lawê Xwedê û Xelaskerê dinê ye

14 Û çawa ku Mûsa di çolê de mar bilind kir, divê Lawê Mirov jî ûsa bilindî jor bibe;

15 da ku, her kesê bawerî bi wî bîne, bila helaq nebe; lê jiyana wî ya abadîn hebe.

16 Ji ber ku Xwedê evqas pirr ji dinê hez kir ku, Lawê xwe yê tekane da; da ku, bila tu kes, ji yê bawerî bi wî bîne helaq nebe, lê bila jiyana wî ya abadîn hebe.

17 Ji ber ku Xwedê bona dinê daraz bike Lawê xwe neşand, lê bona ku dinya bi wî xelas bibe, wî şand.

18 Ew kesê ku bawerî bi wî bîne, nayê daraz kirin; lê belê yê ku bawerî bi wî neaniye, ew jixwe hatiye

den Namen des eingeborenen Sohnes Gottes geglaubt hat.

19 Darin aber besteht das Gericht, dass das Licht in die Welt gekommen ist, und die Menschen liebten die Finsternis mehr als das Licht; denn ihre Werke waren böse.

20 Denn jeder, der Böses tut, hasst das Licht und kommt nicht zum Licht, damit seine Werke nicht aufgedeckt werden.

21 Wer aber die Wahrheit tut, der kommt zum Licht, damit seine Werke offenbar werden, dass sie in Gott getan sind.

Johannes der Täufer und sein Zeugnis von Christus

22 Danach kam Jesus mit seinen Jüngern in das Land Judäa, und dort hielt er sich mit ihnen auf und taufte.

23 Aber auch Johannes taufte in Änon, nahe bei Salim, weil viel Wasser dort war; und sie kamen dorthin und ließen sich taufen.

24 Denn Johannes war noch nicht ins Gefängnis geworfen worden.

25 Es erhob sich nun eine Streitfrage zwischen den Jüngern des Johannes und einigen Juden wegen der Reinigung.

26 Und sie kamen zu Johannes und sprachen zu ihm: Rabbi, der, welcher bei dir war jenseits des Jordan, für den du Zeugnis abgelegt hast, siehe, der tauft, und jedermann kommt zu ihm!

27 Johannes antwortete und sprach: Ein Mensch kann sich nichts nehmen, es sei denn, es ist ihm vom Himmel gegeben.

28 Ihr selbst bezeugt mir, dass ich gesagt habe: Nicht ich bin der Christus, sondern ich bin vor ihm her gesandt.

daraz kirin; ji ber ku wî bawerî bi navê Lawê Xwedê yê tekane neaniye.

19 Û darazî ev e ku, ronahî hat dinê û mirovan ji ronahiyê zêdetir ji tariyê hez kirin; ji ber ku karên wan xerabî bû.

20 Ji ber, her kesê ku xerabiyê dike, ji ronahiyê dikerihe û ji bo ku xebatên wî xuya nebin, ew nayê ronahiyê.

21 Lê belê bona, şuxulandina karê wî yê di Xwedê de bête xuyanî kirin, yê ku rasteqîniyê dike, tê ronahiyê.

Şahdeyiya Yehya ya sêwemîn:

Yê ku ji ezman ve hatiye, li ser her kesî re ye

22 Piştî vêya, Îsa û şagirtên xwe hatin warê Cihûstanê û Îsa li wê derê, bi wan re ma û vaftîz dikir.

23 Yehya jî nêzikî Salîmê, li Aynonê vaftîz dikir; ji ber ku li wê derê zehf av hebû û ew dihatin û li wê derê vaftîz dibûn.

24 Ji ber ku Yehya hîn neavêtibûn zîndanê.

25 Û di navbera şagirtên Yehya û Cihûdekî de, di derheqê kevneşopiya paqîjbûnê de guftegoyek derket.

26 Û ew hatin cem Yehya û gotin: Mamoste, yê ku li aliyê çemê Urdunê bi te re bû, zilamê ku te ji bo wî şahdeyiyê kir, a vay, ew kes vaftîz dike û her kes tîn cem wî!

27 Yehya bersiv da û got: Dema ku ji jor ve tiştê neyê dayîn, kesek nikare tiştêkî bistîne.

28 Min got ez ne Mesîh im, lê ez nûçevanê wî me û hûn jî şahdeyê van gotinê min in.

29 Wer die Braut hat, der ist der Bräutigam; der Freund des Bräutigams aber, der dasteht und ihn hört, ist hocherfreut über die Stimme des Bräutigams. Diese meine Freude ist nun erfüllt.

30 Er muss wachsen, ich aber muss abnehmen.

31 Der von oben kommt, ist über allen. Wer von der Erde ist, der ist von der Erde und redet von der Erde; der aus dem Himmel kommt, ist über allen.

32 Und er bezeugt, was er gesehen und gehört hat, und sein Zeugnis nimmt niemand an.

33 Wer aber sein Zeugnis annimmt, der bestätigt, dass Gott wahrhaftig ist.

34 Denn der, den Gott gesandt hat, redet die Worte Gottes; denn Gott gibt den Geist nicht nach Maß.

35 Der Vater liebt den Sohn und hat alles in seine Hand gegeben.

36 Wer an den Sohn glaubt, der hat ewiges Leben; wer aber dem Sohn nicht glaubt, der wird das Leben nicht sehen, sondern der Zorn Gottes bleibt auf ihm.

Jesus und die Frau aus Samaria.

Das Wasser des Lebens. Die wahren Anbeter Gottes

4 Als nun der Herr erfuhr, dass die Pharisäer gehört hatten, dass Jesus mehr Jünger mache und taufe als Johannes

2 – obwohl Jesus nicht selbst taufte, sondern seine Jünger –,

3 da verließ er Judäa und zog wieder nach Galiläa.

4 Er musste aber durch Samaria reisen.

5 Da kommt er in eine Stadt Samarias, genannt Sichar, nahe bei dem Feld, das Jakob seinem Sohn Joseph gab.

29 Bûk ya kî be, zava jî ew e; lê belê yê ku li ser lingan disekine û wî dibihîze, hevalê zavê ji ber dengê zavê, zehf kêfxweş dibe. Ji bo vê yekê ev kêfxweşiya min, tamam bû.

30 Bona wî mezinahî, bona min jî biçûk bûn hewce dike.

31 Yê ku ji jor ve hatiye, ji hemûyan bilindtir e; yê ku ji erdê ye, ji erdê ye û ji erdê ve dibêje; yê ku ji ezman ve hatiye, li ser her kesî re ye.

32 Wî çî dîtibe û çî bihîstibe ji wê re şahdeyiyê dike û kes şahdeyiya wî qebûl nake.

33 Yê ku şahdeyiya wî qebûl dike, mohrê pê xistiye ku, Xwedê rastî ye.

34 Ji ber, kesê ku Xwedê wî şandiye, gotinên Xwedê dibêje; ji ber ku Xwedê, Ruh bi pîvanê nade.

35 Bav ji Law hez dike û her tiştî daye destê wî.

36 Yê ku baweriyê bi Law bîne jiyana wî ya abadîn heye; lê belê yê ku ji Law re îtaetê nake, ew jiyane nabîne, lê belê xezeba Xwedê li ser wî dimîne.

Ava jiyana abadîn

4 Dema Xudan hîn bû ku Fêrisiyan bihîstiye, Îsa ji Yehya hîn jî zêdetir şagirtan civandiye û vaftîz dike,

2 – lê Îsa ne bi xwe, tenê şagirtên wî vaftîz dikirin –;

3 ew ji Cihûstanê weqetiya û dîsa çû Celîlê.

4 Û hewce dikir ku ew ji Samîriyê ve derbas bibûya.

5 Bi vî awayî, ew hat nêzîkî zeviya ku Aqûp dabû lawê xwe Ûsiv, bajarekî Samîriyê, ya ku jê re digotin Sîhar.

6 Es war aber dort Jakobs Brunnen. Weil nun Jesus müde war von der Reise, setzte er sich so an den Brunnen; es war um die sechste Stunde.

7 Da kommt eine Frau aus Samaria, um Wasser zu schöpfen. Jesus spricht zu ihr: Gib mir zu trinken!

8 Denn seine Jünger waren in die Stadt gegangen, um Speise zu kaufen.

9 Nun spricht die samaritanische Frau zu ihm: Wie erbittest du als ein Jude von mir etwas zu trinken, da ich doch eine samaritanische Frau bin? (Denn die Juden haben keinen Umgang mit den Samaritanern.)

10 Jesus antwortete und sprach zu ihr: Wenn du die Gabe Gottes erkennen würdest und wer der ist, der zu dir spricht: Gib mir zu trinken!, so würdest du ihn bitten, und er gäbe dir lebendiges Wasser.

11 Die Frau spricht zu ihm: Herr, du hast ja keinen Eimer, und der Brunnen ist tief; woher hast du denn das lebendige Wasser?

12 Bist du größer als unser Vater Jakob, der uns den Brunnen gegeben und selbst daraus getrunken hat, samt seinen Söhnen und seinem Vieh?

13 Jesus antwortete und sprach zu ihr: Jeden, der von diesem Wasser trinkt, wird wieder dürsten.

14 Wer aber von dem Wasser trinkt, das ich ihm geben werde, den wird in Ewigkeit nicht dürsten, sondern das Wasser, das ich ihm geben werde, wird in ihm zu einer Quelle von Wasser werden, das bis ins ewige Leben quillt.

15 Die Frau spricht zu ihm: Herr, gib mir dieses Wasser, damit ich nicht dürste und nicht hierherkommen muss, um zu schöpfen!

16 Jesus spricht zu ihr: Geh hin, rufe deinen Mann und komm her!

6 Bîra Aqûp li wê derê bû. Bona ku Îsa di rêwîtiyê de westayî bû, bi vî awayî ew li cem bîrê rûniştibû; saet devdevî şexsan bû.

7 Pîrekek ji Samîriyê hat ku avê bikişîne. Îsa ji wê re got: Avê bide min, ez vexwim!

8 Ji ber ku şagirtên wî ji bo stendina xwarinê çûbûn bajêr.

9 Pîreka Samîriyê jî ji wî re got: Tu Cihûd e û ez jî pîrekek Samîrî me, çawa tu ji min avê dixwazî? Ji ber ku Cihûdan karekî bi Samîriyan re nakin.

10 Îsa bersiv da û ji wê re got: Ger te bi xelata Xwedê û bi kîbûna yê ku ji te re: Avê bide min ku ez vexwim! dibêje bizanîbûya, teyê ji wî bixwesta û wî jî dê ava zindî bida te.

11 Pîrekê jê re got: Efendî, tiştekî teyî tu pê avê bikişînî tune ye û bîr jî kûr e; ma niha ava zindî ji ku derê ve bi te re heye?

12 Ma tu ji bavê me Aqûp, yê ku vê bîrê daye me û tevî law û dewarên xwe ji wê vexwariye, mezin-tir î?

13 Îsa bersiv da û ji wê re got: Her kesê ku ji vê avê vexwe, dê dîsa tî bibe.

14 Lê belê her kî, ji ava ku ez bidimê vexwe, tu carî tî nabe; lê ava ku ez bidim wî, di wî de ji bo jiyana abadîn dibe kaniya ava ku diherike.

15 Pîrekê jê re got: Efendî, vê avê bide min ku ez ne tî bibim û ne jî bona av kişandinê heta vê derê werim!

16 Îsa ji wê re got: Here bangî mêrê xwe bike û were vê derê!

17 Die Frau antwortete und sprach: Ich habe keinen Mann! Jesus spricht zu ihr: Du hast recht gesagt: Ich habe keinen Mann!

18 Denn fünf Männer hast du gehabt, und der, den du jetzt hast, ist nicht dein Mann. Da hast du die Wahrheit gesprochen!

19 Die Frau spricht zu ihm: Herr, ich sehe, dass du ein Prophet bist!

20 Unsere Väter haben auf diesem Berg angebetet, und ihr sagt, in Jerusalem sei der Ort, wo man anbeten soll.

21 Jesus spricht zu ihr: Frau, glaube mir, es kommt die Stunde, wo ihr weder auf diesem Berg noch in Jerusalem den Vater anbeten werdet.

22 Ihr betet an, was ihr nicht kennt; wir beten an, was wir kennen, denn das Heil kommt aus den Juden.

23 Aber die Stunde kommt und ist schon da, wo die wahren Anbeter den Vater im Geist und in der Wahrheit anbeten werden; denn der Vater sucht solche Anbeter.

24 Gott ist Geist, und die ihn anbeten, müssen ihn im Geist und in der Wahrheit anbeten.

25 Die Frau spricht zu ihm: Ich weiß, dass der Messias kommt, welcher Christus genannt wird; wenn dieser kommt, wird er uns alles verkündigen.

26 Jesus spricht zu ihr: Ich bin's, der mit dir redet!

27 Unterdessen kamen seine Jünger und wunderten sich, dass er mit einer Frau redete. Doch sagte keiner: Was willst du? oder: Was redest du mit ihr?

28 Nun ließ die Frau ihren Wasserkrug stehen und lief in die Stadt und sprach zu den Leuten:

17 Pîrekê bersiv da û got: Mêrê min tune! Îsa ji wê re got: Bona ku te got mêrê min tune, tu rast axifî!

18 Ji ber ku te pênc mêrî kiribû û yê ku tu niha tevî disekinî ne mêrê te ye. Te vêya rast got!

19 Pîrekê ji wî re got: Efendî, ez dibînim ku tu peyxamberek î!

20 Kalikên me li vî çiyayî peristinê kirin û hûn dibêjin ku cîhê peristinê li Orşelîmê ye.

21 Îsa ji wê re got: Pîrekê, bi min bawer bike, dem tê ku, wê çaxê ne li wî çiyayî û ne jî li Orşelîmê hûn ê ji Bav re peristinê bikin!

22 Hûn ji yê ku hûn pê nizanin re peristinê dikin, em ji yê ku em pê dizanin re peristinê dikin; ji ber ku xelasî ji Cihûdan ve tê!

23 Lê belê saeta, yên ku bi rastî peristinê dikin, di ruh û rasteqîniyê de peristinê ji Bav re bikin tê û niha ye; ji ber ku Bav li yên ku bi vî awayî peristinê jê re dikin digere.

24 Xwedê Ruh e, kesê ku ji wî re peristinê dikin, divê di ruh û rastiye de peristinê bikin.

25 Pîrekê ji wî re got: Mesîh yê ku hatiye mesh kirinê, ez zanim ku dê ew ê were û ew ê her tiştî bigihîne me.

26 Îsa ji wê re got: Yê ku bi te re diaxife, ez, ew kes im!

27 Li ser vê yekê şagirtên wî hatin û ji ber ku Îsa bi pîrekekê re diaxifî ew şaş man. Lê bele dîsa jî qet kesî negot: Ma tu li çi digerî? an jî: Ma tu çima bi wê pîrekê re diaxifî?

28 Pişt re pîrekê kûzê avê di cîh de hişt û çû bajêr û ji gel re got:

29 Kommt, seht einen Menschen, der mir alles gesagt hat, was ich getan habe! Ob dieser nicht der Christus ist?

30 Da gingen sie aus der Stadt hinaus und kamen zu ihm.

Das weiße Erntefeld

31 Inzwischen aber baten ihn die Jünger und sprachen: Rabbi, iss!

32 Er aber sprach zu ihnen: Ich habe eine Speise zu essen, die ihr nicht kennt!

33 Da sprachen die Jünger zueinander: Hat ihm denn jemand zu essen gebracht?

34 Jesus spricht zu ihnen: Meine Speise ist die, dass ich den Willen dessen tue, der mich gesandt hat, und sein Werk vollbringe.

35 Sagt ihr nicht: Es sind noch vier Monate, dann kommt die Ernte? Siehe, ich sage euch: Hebt eure Augen auf und seht die Felder an; sie sind schon weiß zur Ernte.

36 Und wer erntet, der empfängt Lohn und sammelt Frucht zum ewigen Leben, damit sich der Sämann und der Schnitter miteinander freuen.

37 Denn hier ist der Spruch wahr: Der eine sät, der andere erntet.

38 Ich habe euch ausgesandt zu ernten, woran ihr nicht gearbeitet habt; andere haben gearbeitet, und ihr seid in ihre Arbeit eingetreten.

Der Glaube der Samariter

39 Aus jener Stadt aber glaubten viele Samariter an ihn um des Wortes der Frau willen, die bezeugte: Er hat mir alles gesagt, was ich getan habe.

40 Als nun die Samariter zu ihm kamen, baten sie ihn, bei ihnen zu bleiben; und er blieb zwei Tage dort.

29 Werin, mirovê her tiştê ku min kiriye ji min re got bibînin! Gelo Mesîh ev e?

30 Ew jî ji bajêr derketin û hatin cem wî.

31 Di vê navberê de şagirtan jê rica kirin û gotin: Rebbî, bixwe!

32 Lê belê Îsa ji wan re got: Xwarinek min heye, hûn pê nizanin!

33 Şagirtan ji hev û din re gotin: Gelo kesî ji wî re xwarin aniye?

34 Îsa ji wan re got: Xwarina min, bi cîh anîna xwestina yê ku min şandiye û serfiraziya karê wî ye.

35 Ma hûn nabêjin: Hîn bona zad çinînê çar meh heye? A vay, ez ji we re dibêjim: Serê xwe bilind bikin û li zeviyên ku bona bête çinîn zer bûne binihêrin!

36 Bona yê ku ajotiye û yê ku diçîne pev re kêfxweş bibin, yê ku diçîne heqdestê xwe digire û ji bo jiyana abadîn zadê dide hev.

37 Ji ber ew gotina ku: Yek dajo û yekî din jî diçîne, di vêya de rast e.

38 Min we, ji bo çinîna zadê ku we ji bo wê ked nedane şand; hinekên din ked dan û hûn ketin keda wan.

Gelê Samîriyê bawerî bi Îsa tînin

39 Li ser gotina pîreka ku: Hemû kirinên min, ji min re got, şahdeyiyê kiribû, li wî bajarî ji Samîriyan gellekan bawerî bi Îsa anîn.

40 Dema ku Samîrî hatin cem wî, bona ku li cem wan bimîne li ber wî geriyan; ew jî du roj li wir ma.

41 Und noch viel mehr Leute glaubten um seines Wortes willen.

42 Und zu der Frau sprachen sie: Nun glauben wir nicht mehr um deiner Rede willen; wir haben selbst gehört und erkannt, dass dieser wahrhaftig der Retter der Welt, der Christus ist!

Jesus heilt den Sohn eines königlichen Beamten

43 Nach den zwei Tagen aber zog er fort und ging nach Galiläa.

44 Jesus selbst bezeugte zwar, dass ein Prophet in seinem eigenen Vaterland nicht geachtet wird.

45 Als er aber nun nach Galiläa kam, nahmen ihn die Galiläer auf, weil sie alles gesehen hatten, was er während des Festes in Jerusalem getan hatte; denn auch sie waren zu dem Fest gekommen.

46 Jesus kam nun wieder nach Kana in Galiläa, wo er das Wasser zu Wein gemacht hatte. Und da gab es einen königlichen Beamten, dessen Sohn lag krank in Kapernaum.

47 Als dieser hörte, dass Jesus aus Judäa nach Galiläa gekommen sei, ging er zu ihm und bat ihn, er möchte herabkommen und seinen Sohn gesund machen; denn er lag im Sterben.

48 Da sprach Jesus zu ihm: Wenn ihr nicht Zeichen und Wunder seht, so glaubt ihr nicht!

49 Der königliche Beamte spricht zu ihm: Herr, komm herab, ehe mein Kind stirbt!

50 Jesus spricht zu ihm: Geh hin, dein Sohn lebt! Und der Mensch glaubte dem Wort, das Jesus zu ihm sprach, und ging hin.

41 Û li ser gotina wî, hîn gellek kesên din jî bawerî anîn.

42 Û ji pîrekê re digotin: Êdî bawerî anîna me ne li ser gotina te ye; ji ber ku me bi xwe bihîstin û em dizanin ku bi rastî Xelaskerê dinê ev e!

Îsa lawê karmendekî baş dike

43 Piştî van herdu rojan, Îsa ji wir çû Celîlê.

44 Ji ber ku Îsa bi xwe di derheqê peyxamberek di welatê xwe de ne bi qedr û qîmet e de şahdeyiyê kiribû.

45 Gava ku ew hate Celîlê, Celîliyan wî qebûl kirin; ji ber ku ew jî beşdarî cejnê bûbûn û di dema cejnê de, hemû tiştên ku li Orşelîmê kiribû, dîtibûn.

46 Li ser vêya, Îsa dîsa hat Kanaya Celîlê ku wî li wê derê avê kiribû xemr û li wir karmendekî qiral hebû, lawê wî li Kefernahûmê nexweş bû.

47 Dema ku wî bihîst Îsa ji Cihûstanê hatiye bajarê Celîlê, çû cem wî û jê rica kir ku ew were lawê wî yê nexweş baş bike, ji ber ku ew li ber mirinê bû.

48 Wê demê Îsa ji wî re got: Hûn heta ku alamet û nuwaze nebînin, tu carî baweriyê naynin!

49 Karmendê qiral ji wî re got: Efendî, berî ku lawê min bimire, dakeve!

50 Îsa jê re got: Here, lawê te dijî! Zilam bawerî bi gotina ku Îsa ji wî re gotibû, anî û çû.

51 Als er aber noch unterwegs war, kamen ihm seine Knechte entgegen und berichteten ihm und sprachen: Dein Sohn lebt!

52 Nun erkundigte er sich bei ihnen nach der Stunde, in welcher es mit ihm besser geworden war. Und sie sprachen zu ihm: Gestern um die siebte Stunde verließ ihn das Fieber.

53 Da erkannte der Vater, dass es eben in der Stunde geschehen war, in welcher Jesus zu ihm gesagt hatte: Dein Sohn lebt! Und er glaubte samt seinem ganzen Haus.

54 Dies ist das zweite Zeichen, das Jesus wiederum tat, als er aus Judäa nach Galiläa kam.

Jesus heilt am Sabbat einen Kranken beim Teich Bethesda

5 Danach war ein Fest der Juden, und Jesus zog hinauf nach Jerusalem.

2 Es ist aber in Jerusalem beim Schaftor ein Teich, der auf Hebräisch Bethesda heißt und der fünf Säulenhallen hat.

3 In diesen lag eine große Menge von Kranken, Blinden, Lahmen und Abgekehrten, welche auf die Bewegung des Wassers warteten.

4 Denn ein Engel stieg zu gewissen Zeiten in den Teich hinab und bewegte das Wasser. Wer nun nach der Bewegung des Wassers zuerst hineinstieg, der wurde gesund, mit welcher Krankheit er auch geplagt war.

5 Es war aber ein Mensch dort, der 38 Jahre in der Krankheit zugebracht hatte.

6 Als Jesus diesen daliegen sah und erfuhr, dass er schon so lange Zeit [in diesem Zustand] war, spricht er zu ihm: Willst du gesund werden?

51 Hîn ew di rê de bû, xulamên wî derketin pêrgî-niya wî û jê re gotin: Lawê te dijî!

52 Wî, saeta ku lawê wî dest bi başbûnê kiriye ji xulaman pirsî. Wan jî ji wî re gotin: Doh, di saeta heftemîn de ta wî berda.

53 Wê çaxê bav fêhm kir ku, ev ew saeta Îsa ji wî re gotibû ku: Lawê te dijî ye! û wî bi temamê gelê mala xwe ve bawerî anîn.

54 Dema Îsa ji Cihûstanê hat Celîlê, ev mûcîza duduyan bû ku wî çêkir.

Mirovê ku sî û heyşt sal e nexweş e tê başkirin

5 Piştî vêya cejneke Cihûdan hebû û Îsa çû Orşelîmê.

2 Li Orşelîmê, li cem Deriyê Mihê, hewzek bi zimanê Îbranî jê re Beythesta tê gotin; ya ku pênc eywanên wê hebûn, heye.

3 Di nav vana de civakek mezin ya nexweşan, ya ji kor û kûd û falinc radiketin; ew li benda çelqandinê avê bûn.

4 Ji ber ku dem demî milyaketekî Xudan dadiket nav û avê diçelqand. Paşî ku av diçelqiya, kesê ku pêşiyê biketa nav avê, her bi çi nexweşiyê ve ketibe, ji wê ve xelas dibû.

5 Ê zilamekî ku sî û heyşt sal nexweşiya xwe dikişîne li wê derê bû.

6 Gava Îsa wî veketî dît û bi zanîna ku ew demekî dirêj e nexweş e; jê re got: Ma tu dixwazî baş bibî?

7 Der Kranke antwortete ihm: Herr, ich habe keinen Menschen, der mich in den Teich bringt, wenn das Wasser bewegt wird; während ich aber selbst gehe, steigt ein anderer vor mir hinab.

8 Jesus spricht zu ihm: Steh auf, nimm deine Liegematte und geh umher!

9 Und sogleich wurde der Mensch gesund, hob seine Liegematte auf und ging umher. Es war aber Sabbat an jenem Tag.

10 Nun sprachen die Juden zu dem Geheilten: Es ist Sabbat; es ist dir nicht erlaubt, die Liegematte zu tragen!

11 Er antwortete ihnen: Der mich gesund machte, der sprach zu mir: Nimm deine Liegematte und geh umher!

12 Da fragten sie ihn: Wer ist der Mensch, der zu dir gesagt hat: Nimm deine Liegematte und geh umher?

13 Aber der Geheilte wusste nicht, wer es war, denn Jesus war weggegangen, weil so viel Volk an dem Ort war.

14 Danach findet ihn Jesus im Tempel und spricht zu ihm: Siehe, du bist gesund geworden; sündige hinfort nicht mehr, damit dir nicht etwas Schlimmeres widerfährt!

15 Da ging der Mensch hin und verkündete den Juden, dass es Jesus war, der ihn gesund gemacht hatte.

16 Und deshalb verfolgten die Juden Jesus und suchten ihn zu töten, weil er dies am Sabbat getan hatte.

Jesus offenbart sich als der Sohn Gottes

17 Jesus aber antwortete ihnen: Mein Vater wirkt bis jetzt, und ich wirke auch.

18 Darum suchten die Juden nun noch mehr, ihn zu töten, weil er nicht nur den Sabbat brach, sondern auch Gott seinen eigenen Vater nannte, womit er sich selbst Gott gleich machte.

7 Nexweş bersivê da wî: Efendî, dema ku av diçelqe, kesê min tune ku min deyne nav avê û dema ku ez têm, berî min yekî din dikeve nav avê.

8 Îsa ji wî re got: Rabe, livînê xwe hilde û bimeşe!

9 Û zilam hema baş bû û livînê xwe hilgirt û meşiya. Ew roj roja Sebtê bû.

10 Ji ber vê yekê Cihûdan ji wî mirovê ku baş bûye re gotin: Îro Sebt e; ji te re ne caiz e ku tu livînê xwe rake!

11 Lê belê wî bersiv da wan: Ew mirovê ku ez baş kirim, ji min re got, livînê xwe hilgire û bimeşe!

12 Wan jê pirs kirin: Mirovê ku ji te re got: Livînê xwe hilgire û bimeşe kî ye?

13 Lê belê zilamê ku baş bûbû, nezanîbû ku ew kî ye; ji ber ku li wê derê zehf ajawe hebû, Îsa vekîşiyabû.

14 Piştî vêya, Îsa wî di Perestgehê de dît û ji wî re got: A vay, tu baş bûyî; êdî gunehan neke ku tişteke hîn jî xerabtir neyê serê te!

15 Mirov çû cem Cihûdan û ji wan re got, ew mirovê ku ez baş kirim Îsa ye.

16 Ji bo vê yekê Cihûdan li Îsa digeriyan û dixwestin ku wî bikujin; ji ber ku wî, vî karî di roja Sebtê de çêkiribû.

Îsa bi xwe dibêje ku ew Lawê Xwedê ye

17 Lê belê Îsa bersiv da wan: Bavê min heta niha dixebite û ez jî dixebitim.

18 Ji bo vê yekê Cihûdan hîn jî bêtir bo kuştina Îsa xebitîn; ji ber ku ew tenê bi xera kirina roja Sebtê nema bû, lê belê bi gotina: Xwedê Bavê min e, wî xwe bi Xwedê re kiribû yek.

19 Da antwortete Jesus und sprach zu ihnen: Wahrlich, wahrlich, ich sage euch: Der Sohn kann nichts von sich selbst aus tun, sondern nur, was er den Vater tun sieht; denn was dieser tut, das tut gleicherweise auch der Sohn.

20 Denn der Vater liebt den Sohn und zeigt ihm alles, was er selbst tut; und er wird ihm noch größere Werke zeigen als diese, sodass ihr euch verwundern werdet.

21 Denn wie der Vater die Toten auferweckt und lebendig macht, so macht auch der Sohn lebendig, welche er will.

22 Denn der Vater richtet niemand, sondern alles Gericht hat er dem Sohn übergeben,

23 damit alle den Sohn ehren, wie sie den Vater ehren. Wer den Sohn nicht ehrt, der ehrt den Vater nicht, der ihn gesandt hat.

24 Wahrlich, wahrlich, ich sage euch: Wer mein Wort hört und dem glaubt, der mich gesandt hat, der hat ewiges Leben und kommt nicht ins Gericht, sondern er ist vom Tod zum Leben hindurchgedrungen.

25 Wahrlich, wahrlich, ich sage euch: Die Stunde kommt und ist schon da, wo die Toten die Stimme des Sohnes Gottes hören werden, und die sie hören, werden leben.

26 Denn wie der Vater das Leben in sich selbst hat, so hat er auch dem Sohn verliehen, das Leben in sich selbst zu haben.

27 Und er hat ihm Vollmacht gegeben, auch Gericht zu halten, weil er der Sohn des Menschen ist.

28 Verwundert euch nicht darüber! Denn es kommt die Stunde, in der alle, die in den Gräbern sind, seine Stimme hören werden,

29 und sie werden hervorgehen: die das Gute getan haben, zur Auferstehung des Lebens; die aber das Böse getan haben, zur Auferstehung des Gerichts.

geht, wollt ihr tun! Der war ein Menschenmörder von Anfang an und steht nicht in der Wahrheit, denn Wahrheit ist nicht in ihm. Wenn er die Lüge redet, so redet er aus seinem Eigenen, denn er ist ein Lügner und der Vater derselben.

45 Weil aber ich die Wahrheit sage, glaubt ihr mir nicht.

46 Wer unter euch kann mich einer Sünde beschuldigen? Wenn ich aber die Wahrheit sage, warum glaubt ihr mir nicht?

47 Wer aus Gott ist, der hört die Worte Gottes; darum hört ihr nicht, weil ihr nicht aus Gott seid.

Entehrung und Ablehnung des Sohnes Gottes

48 Da antworteten die Juden und sprachen zu ihm: Sagen wir nicht mit Recht, dass du ein Samariter bist und einen Dämon hast?

49 Jesus erwiderte: Ich habe keinen Dämon, sondern ich ehre meinen Vater, und ihr entehrt mich.

50 Ich aber suche nicht meine Ehre; es ist Einer, der sie sucht und der richtet.

51 Wahrlich, wahrlich, ich sage euch: Wenn jemand mein Wort bewahrt, so wird er den Tod nicht sehen in Ewigkeit!

52 Da sprachen die Juden zu ihm: Jetzt erkennen wir, dass du einen Dämon hast! Abraham ist gestorben und die Propheten, und du sagst: Wenn jemand mein Wort bewahrt, so wird er den Tod nicht schmecken in Ewigkeit!

53 Bist du größer als unser Vater Abraham, der gestorben ist? Und die Propheten sind auch gestorben. Was machst du aus dir selbst?

54 Jesus antwortete: Wenn ich mich selbst ehre, so ist

xwestina bavê xwe bikin! Ew ji destpêkê ve qesas bû û ew di rastiyê de nesekinî; ji ber ku di wî de rastî tune ye. Dema ku ew derew dike, ji yê xwe ve dibêje; ji ber ku ew derewçîn e û bavê derewan e.

45 Lê belê bona ku ez rastiyê dibêjim, hûn bawerî bi min naynin.

46 Di nav we de kî dikare hebûna guneh di min de îspat bike? Madem ku ez ji we re rastiyê dibêjim, hûn çima bawerî bi min naynin?

47 Yê ku ji Xwedê ne, ew guh didin gotinên Xwedê; ji bo vê yekê hûn guh nadin, ji ber ku hûn ne ji Xwedê ne.

Lawê Xwedê tê red kirin

48 Cihûdan bersiv dan û ji wî re gotin: Me ji te re got, tu ji Samîriyê yî û di te de cin heye, ma gotina me ne rast e?

49 Îsa bersiv da: Di min de cin nîne; lê belê ez ji Bavê xwe re hurmetê dikim û hûn jî min nizm dikin.

50 Lê belê ez li mezinahiya xwe nagerim; yekî ku digere û daraziyê dike heye.

51 Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Ger mirovek bi gotina min bigire, ew heta bi hetayê mirinê nabîne!

52 Cihûdan ji wî re gotin: Me niha fêhm kirin ku, di te de cinek heye! Birahîm mir, peyxamber jî û tu dibêjî: Ger kesek bi gotina min bigire, heta bi hetayê mirinê tahm nake!

53 An tu ji bavê me Birahîm mezintir î? Ew mir, peyxamber jî mirin; ma tu dibêje qey tu kî yî?

54 Îsa bersiv da: Ger ez xwe bilind bikim, bilinda-

meine Ehre nichts; mein Vater ist es, der mich ehrt, von dem ihr sagt, er sei euer Gott.

55 Und doch habt ihr ihn nicht erkannt; ich aber kenne ihn. Und wenn ich sagen würde: Ich kenne ihn nicht!, so wäre ich ein Lügner, gleich wie ihr. Aber ich kenne ihn und halte sein Wort.

56 Abraham, euer Vater, frohlockte, dass er meinen Tag sehen sollte; und er sah ihn und freute sich.

57 Da sprachen die Juden zu ihm: Du bist noch nicht 50 Jahre alt und hast Abraham gesehen?

58 Jesus sprach zu ihnen: Wahrlich, wahrlich, ich sage euch: Ehe Abraham war, bin ich!

59 Da hoben sie Steine auf, um sie auf ihn zu werfen. Jesus aber verbarg sich und ging zum Tempel hinaus, mitten durch sie hindurch, und entkam so.

Die Heilung eines Blindgeborenen

9 Und als er vorbeiging, sah er einen Menschen, der blind war von Geburt an.

2 Und seine Jünger fragten ihn und sprachen: Rabbi, wer hat gesündigt, sodass dieser blind geboren ist, er oder seine Eltern?

3 Jesus antwortete: Weder dieser hat gesündigt noch seine Eltern; sondern an ihm sollten die Werke Gottes offenbar werden!

4 Ich muss die Werke dessen wirken, der mich gesandt hat, solange es Tag ist; es kommt die Nacht, da niemand wirken kann.

5 Solange ich in der Welt bin, bin ich das Licht der Welt.

6 Als er dies gesagt hatte, spie er auf die Erde und machte einen Brei mit dem Speichel und strich den Brei auf die Augen des Blinden

7 und sprach zu ihm: Geh hin, wasche dich im Teich

hiya min ne tiştêk e; yê ku min bilind dike, Bavê min e; hûn dibêjin: Ew Xwedayê me ye.

55 Û hûn wî nas nakin; lê belê ez wî nas dikim û ger ez bêjim: Ez wî nas nakim! wê çaxê ez jî mîna we derewîn dibim; lê belê ez wî nas dikim û bi gotina wî ve digirim.

56 Bavê we Birahîm bona ku ew roja min bibîne bi kêfxweşiyê coşiya; wî ew dît û dilgeş bû.

57 Bo vê yekê Cihûdan ji wî re gotin: Tu hîn pêncî salî nîne; ma te Birahîm jî dîtiye?

58 Îsa ji wan re got: Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Ji berî ku Birahîm hebe ez heme!

59 Wê çaxê bona ku Îsa bidin ber keviran wan ji erdê kevir rakirin, lê belê Îsa xwe veşart û ji Perestgehê ve derket.

Îsa çavên mirovekî kor vedike

9 Û dema ku ew derbas dibû, mirovekî ku ji bûyîna xwe ve kor e dît.

2 Şagirtên wî jê pirs kirin û gotin: Rebbî, ji bo ku ev zîlam kor welidiye kî guneh kir; wî, an jî dayik û bavê wî?

3 Îsa bersiv da: Ne wî guneh kir, ne jî dayik û bavê wî; lê bona ku karên Xwedê li ser wî daxuyanî bibin, ew çêbûye!

4 Divê hîn ku roj e ez karên yê ku ez şandime bikim; şev tê, wê çaxê tu kes nikare kar bike.

5 Heta ku ez di dinê de me, ez ronahiya dinê me.

6 Piştî ku wî van tiştan got, tûyî erdê kir, bi tûka xwe heriyê çêkir û wê heriyê di çavên wî da

7 û ji wî re got: Here, di burka Şîloamê (ku bi navê:

Siloah (das heißt übersetzt: »Der Gesandte«)! Da ging er hin und wusch sich und kam sehend wieder.

8 Die Nachbarn nun, und die ihn zuvor als Blinden gesehen hatten, sprachen: Ist das nicht der, welcher dasaß und bettelte?

9 Etliche sagten: Er ist's! – andere aber: Er sieht ihm ähnlich! Er selbst sagte: Ich bin's!

10 Da sprachen sie zu ihm: Wie sind deine Augen geöffnet worden?

11 Er antwortete und sprach: Ein Mensch, der Jesus heißt, machte einen Brei und bestrich meine Augen und sprach zu mir: Geh hin zum Teich Siloah und wasche dich! Als ich aber hinging und mich wusch, wurde ich sehend.

12 Da sprachen sie zu ihm: Wo ist er? Er antwortete: Ich weiß es nicht!

Verhör des Geheilten durch die Pharisäer

13 Da führten sie ihn, der einst blind gewesen war, zu den Pharisäern.

14 Es war aber Sabbat, als Jesus den Teig machte und ihm die Augen öffnete.

15 Nun fragten ihn auch die Pharisäer wieder, wie er sehend geworden war. Und er sprach zu ihnen: Einen Brei hat er auf meine Augen gelegt, und ich wusch mich und bin nun sehend!

16 Da sprachen etliche von den Pharisäern: Dieser Mensch ist nicht von Gott, weil er den Sabbat nicht hält! Andere sprachen: Wie kann ein sündiger Mensch solche Zeichen tun? Und es entstand eine Spaltung unter ihnen.

17 Sie sprachen wiederum zu dem Blinden: Was sagst du von ihm, weil er dir die Augen geöffnet hat? Er aber sprach: Er ist ein Prophet!

Hatiye Şandin, tête wergerandin) de xwe bişo! Ew jî çû xwe şuşt û çavê wî vebû û bi vî awayî vegeyriya hat.

8 Wê demê cînarê wî û ew kesên ku dîtibûn ew berê parsek bû, gotin: Ma viya ne ew mirovê ku rûdinişt û parsê dikire yî?

9 Hinan gotin: Erê, ew e! hinekan gotin: Na, ew nîne, lê belê mîna wî ye! Wî bi xwe got: Ez im!

10 Wê çaxê wan jê re gotin: Ma çavê te çawa vebûn?

11 Wî bersiv da û got: Ew mirovê ku navê wî Îsa ye, wî heriyê çêkir û di çavê min ve da û ji min re got: Here, di burka Şîloamê de xwe bişo! Lê gava ez çûm li wê derê û min xwe şuşt, çavên min vebûn.

12 Wan ji wî re gotin: Ew li ku ye? Wî got: Ez nizanîm!

Fêrisî dest bi lêkolînê dikin

13 Ew mirovê ku berê kor bû, birin cem Fêrisiyan.

14 Roja ku Îsa herî çêkir û çavên wî vekirin, roja Sebtê bû.

15 Fêrisiyan jî dîsa ji wî pirs kirin û gotin, çavên te çawa vebûn? Wî jî ji wan re got: Wî herî di çavên min ve da, min jî xwe şuşt û niha dibînim!

16 Ji ber vê yekê ji Fêrisiyan hin kesan gotin: Ev mirov ne ji Xwedê ye; ji ber ku ew bi roja Sebtê ve nagire! Hinên din jî gotin: Gunehkarek çawa dikare ku mûcîzeyên ûsa çêbike? Û di navbera wan de cudayî çêbû.

17 Wan dîsa ji mirovê kor re gotin: Tu ji bo wî mirovê ku çavên te vekirine, çi dibêjî? Wî jî got: Ew peyxamber e!

18 Nun glaubten die Juden nicht von ihm, dass er blind gewesen und sehend geworden war, bis sie die Eltern des Sehendgewordenen gerufen hatten.

19 Und sie fragten sie und sprachen: Ist das euer Sohn, von dem ihr sagt, dass er blind geboren ist? Wieso ist er denn jetzt sehend?

20 Seine Eltern antworteten ihnen und sprachen: Wir wissen, dass dieser unser Sohn ist und dass er blind geboren ist;

21 wieso er aber jetzt sieht, das wissen wir nicht; und wer ihm die Augen geöffnet hat, wissen wir auch nicht. Er ist alt genug; fragt ihn selbst. Er soll selbst für sich reden!

22 Das sagten seine Eltern deshalb, weil sie die Juden fürchteten; denn die Juden waren schon übereingekommen, dass, wenn einer ihn als den Christus anerkennen würde, dieser aus der Synagoge ausgeschlossen werden sollte.

23 Darum sprachen seine Eltern: Er ist alt genug; fragt ihn selbst!

24 Da riefen sie zum zweiten Mal den Menschen, der blind gewesen war, und sprachen zu ihm: Gib Gott die Ehre! Wir wissen, dass dieser Mensch ein Sünder ist.

25 Da antwortete jener und sprach: Ob er ein Sünder ist, weiß ich nicht. Eines weiß ich: dass ich blind war und jetzt sehend bin!

26 Sie sprachen aber wiederum zu ihm: Was hat er mit dir gemacht? Wie hat er dir die Augen geöffnet?

27 Er antwortete ihnen: Ich habe es euch schon gesagt, und ihr habt nicht darauf gehört; warum wollt ihr es noch einmal hören? Wollt auch ihr seine Jünger werden?

28 Sie beschimpften ihn nun und sprachen: Du bist sein Jünger! Wir aber sind Moses Jünger.

29 Wir wissen, dass Gott zu Mose geredet hat; von diesem aber wissen wir nicht, woher er ist.

30 Da antwortete der Mensch und sprach zu ihnen: Das

18 Cihûdan heta ku bangî dayik û bavê wî mirovê ku berê kor bû nekirin, bawer nekirin ku ew berê kor bû û niha çavên wî vebûne.

19 Û ji wan pirs kirin û gotin: Ma lawê we yê ku hûn dibêjin kor welidiye, ev e? Ger wisa be, ma niha ew çawa dibîne?

20 Dayik û bavê wî bersiv dan wan û gotin: Em zanin ku ev lawê me ye û kor welidiye;

21 Lê belê em nizanin ku ew niha çawa dibîne, an jî kî çavên wî vekirine em nizanin; jê pirs bikin. Ew mezin e, ji bo xwe bila ew biaxife!

22 Dayik û bavê wî ji Cihûdan ditirsiyan, bo vê yekê wan ûsa got; ji ber ku Cihûdan di nav xwe de biryarê dabûn ku, kî bi eşkereyî bibêje ew Mesîh e, ew ê wan ji kenîştê bavêjin.

23 Bo vê yekê dayik û bavê wî gotin: Ew mezin e, ji wî bipirsin!

24 Li ser vêya wan cara duwemîn bangî mirovê ku berê kor bû kirin û jê re gotin: Şikiryê ji Xwedê re bike! Em dizanin ku ev zilamekî gunehkar e.

25 Wî jî bersiv da û got: Ew gunehkar e an jî ne gunehkar e, ez nizanim. Ez tiştêkî dizanim: Ez kor bûm û niha dibînim!

26 Wê çaxê ji wî re gotin: Wî ji te re çî kir? Wî çavên te çawa vekir?

27 Wî bersiv da wan: Min niha ji we re got û we guhdarî nekirin; çima hûn dixwazin vêya dîsa bibihîzin? An hûn jî dixwazin bibin şagirtên wî?

28 Wan ji wî re kufrê kirin û gotin: Tu şagirtê wî yî! Lê belê em şagirtên Mûsa ne.

29 Em dizanin ku Xwedê ji Mûsa re gotiye; lê belê em nizanin ku ev mirov ji ku ve hatiye.

30 Mirov bersiv da wan û ji wan re got: Ev e tiştê

ist doch verwunderlich, dass ihr nicht wisst, woher er ist, und er hat doch meine Augen geöffnet.

31 Wir wissen aber, dass Gott nicht auf Sünder hört; sondern wenn jemand gottesfürchtig ist und seinen Willen tut, den hört er.

32 Von Ewigkeit her hat man nicht gehört, dass jemand einem Blindgeborenen die Augen geöffnet hat.

33 Wenn dieser nicht von Gott wäre, so könnte er nichts tun!

34 Sie antworteten und sprachen zu ihm: Du bist ganz in Sünden geboren und willst uns lehren? Und sie stießen ihn hinaus.

Blinde sehen und Sehende werden blind

35 Jesus hörte, dass sie ihn ausgestoßen hatten, und als er ihn fand, sprach er zu ihm: Glaubst du an den Sohn Gottes?

36 Er antwortete und sprach: Wer ist es, Herr, damit ich an ihn glaube?

37 Jesus aber sprach zu ihm: Du hast ihn gesehen, und der mit dir redet, der ist es!

38 Er aber sprach: Ich glaube, Herr! und fiel anbetend vor ihm nieder.

39 Und Jesus sprach: Ich bin zum Gericht in diese Welt gekommen, damit die, welche nicht sehen, sehend werden und die, welche sehen, blind werden.

40 Und dies hörten etliche der Pharisäer, die bei ihm waren, und sprachen zu ihm: Sind denn auch wir blind?

41 Jesus sprach zu ihnen: Wenn ihr blind wäret, so hättet ihr keine Sünde; nun sagt ihr aber: Wir sind sehend! – deshalb bleibt eure Sünde.

ku mirov şaş dike, hûn nizanin ew ji ku ve hatiye, lê belê wî çavên min vekirin!

31 Em dizanin ku Xwedê guh nade kesên gunehkar; lê belê ger kesek ji Xwedê re peristinê bike û xwestina wî bîne cîh, ew guh dide wî.

32 Ji demên bêpêşî ve hîn kesî nebihîstiye ku, tu kesî çavên mirovekî ku kor welidiye, vekiriye.

33 Ger ev mirov ne ji Xwedê bûya, wî nikarîbû ku tu tişteki çêbike!

34 Wan bersiv dan û ji wî re gotin: Tu ji ser û pê di nav gunehan de bûyiye, ma tuyê hînî me bikî? Û wan wî avêtin derve.

Yên kor dibînin û yên dibînin jî kor dibin

35 Îsa bihîst ku wan wî avêtine derve û gava wî ew dît jê re got: Tu baweriyê bi Lawê Mirov tîni?

36 Wî bersiv da û got: Ya Xudan, kî ye ku, ez baweriyê bi wî bînim?

37 Îsa ji wî re got: Him te wî dît û him jî yê ku bi te re diaxife, ew e!

38 Û wî got: Ya Xudan, ez bawer dikim! û ji wî re secde kir.

39 Îsa jî got: Ez hatim, bila yê ku kor in, bibînin û yê ku ne kor in jî kor bibin; ez ji bo darazkirinê hatim vê dinê.

40 Hin kesên Fêrisî yê li cem wî bûn, dema ku ev bihîstin, jê re gotin: Ma em jî kor in?

41 Îsa ji wan re got: Ger hûn kor bûna, gunehên we dê tunebûya; lê belê niha hûn dibêjin: Em dibînin, bo vê yekê gunehê we dimîne!

Der gute Hirte

10 Wahrlich, wahrlich, ich sage euch: Wer nicht durch die Tür in die Schafhürde hineingeht, sondern anderswo hineinsteigt, der ist ein Dieb und ein Räuber.

2 Wer aber durch die Tür hineingeht, ist der Hirte der Schafe.

3 Diesem öffnet der Türhüter, und die Schafe hören auf seine Stimme, und er ruft seine eigenen Schafe beim Namen und führt sie heraus.

4 Und wenn er seine Schafe herausgelassen hat, geht er vor ihnen her; und die Schafe folgen ihm nach, denn sie kennen seine Stimme.

5 Einem Fremden aber folgen sie nicht nach, sondern fliehen vor ihm; denn sie kennen die Stimme der Fremden nicht.

6 Dieses Gleichnis sagte ihnen Jesus. Sie verstanden aber nicht, wovon er zu ihnen redete.

7 Da sprach Jesus wiederum zu ihnen: Wahrlich, wahrlich, ich sage euch: Ich bin die Tür für die Schafe.

8 Alle, die vor mir kamen, sind Diebe und Räuber; aber die Schafe hörten nicht auf sie.

9 Ich bin die Tür. Wenn jemand durch mich hineingeht, wird er gerettet werden und wird ein- und ausgehen und Weide finden.

10 Der Dieb kommt nur, um zu stehlen, zu töten und zu verderben; ich bin gekommen, damit sie das Leben haben und es im Überfluss haben.

11 Ich bin der gute Hirte; der gute Hirte lässt sein Leben für die Schafe.

12 Der Mietling aber, der kein Hirte ist, dem die Schafe nicht gehören, sieht den Wolf kommen und verlässt die Schafe und flieht; und der Wolf raubt und zerstreut die Schafe.

Şivanê qenc

10 Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Yê ku di derî re naçe hewşa mîhan û ji rêke din re dikevê diz û rêbir e.

2 Lê belê yê ku di derî re diçe hundir, ew şivanê mîhan e.

3 Dergevan ji wî re derî vedike û mîh dengê wî dibihîzin; ew jî bi navê wan bangî mîhê xwe dike û wan dibe derve.

4 Dema ku wî hemû mîhên xwe derxist derve, ew di pêşiya wan de diçe û mîh li pey wî diçin; ji ber ku ew dengê wî nas dikin.

5 Û li pey yekî xerîb naçin, lê belê ji ber wî direvin; ji ber ku dengê xerîban nas nakin.

6 Îsa ji wan re vê wekokê got, lê belê wan fêhm nekirin ku, ew ji wan re çî dibêje.

7 Û li ser vê yekê Îsa ji wan re dîsa got: Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Ez deriyê mîha me.

8 Hemûyên ku berî min hatine, diz û rêbir in, lê belê mîhan guh nedan wan.

9 Ez derî me. Ger kesek di min de bikeve hundir, xelas dibe; dikeve hundir, derdikeve û çêregeh dibîne.

10 Diz tenê ji bo diziyê, kuştinê û qelihandinê tê. Ez bona ku di wan de jiyan hebe û gellekî jiyan hebe hatim.

11 Ez şivanê qenc im; şivanê qenc di oxra mîhê xwe de canê xwe dide.

12 Ew mirovê ku şivan û xwediyê mîhan nîne yê bi heqdest, dema ku ew hatina gur bibîne, ji ber ku mîh ne yên wî ne, wan berdide û direve, diçe; gur jî bi wan digire û belav dike.

13 Der Mietling aber flieht, weil er ein Mietling ist und sich nicht um die Schafe kümmert.

14 Ich bin der gute Hirte und kenne die Meinen und bin den Meinen bekannt,

15 gleichwie der Vater mich kennt und ich den Vater kenne; und ich lasse mein Leben für die Schafe.

16 Und ich habe noch andere Schafe, die nicht aus dieser Schafhürde sind; auch diese muss ich führen, und sie werden meine Stimme hören, und es wird *eine* Herde und *ein* Hirte sein.

17 Darum liebt mich der Vater, weil ich mein Leben lasse, damit ich es wieder nehme.

18 Niemand nimmt es von mir, sondern ich lasse es von mir aus. Ich habe Vollmacht, es zu lassen, und habe Vollmacht, es wieder zu nehmen. Diesen Auftrag habe ich von meinem Vater empfangen.

19 Da entstand wiederum eine Spaltung unter den Juden um dieser Worte willen;

20 und viele von ihnen sagten: Er hat einen Dämon und ist von Sinnen, weshalb hört ihr auf ihn?

21 Andere sagten: Das sind nicht die Worte eines Besessenen. Kann denn ein Dämon Blinden die Augen öffnen?

22 Es fand aber in Jerusalem das Fest der Tempelweihe statt; und es war Winter.

23 Und Jesus ging im Tempel in der Halle Salomos umher.

24 Da umringten ihn die Juden und sprachen zu ihm: Wie lange hältst du unsere Seele im Zweifel? Bist du der Christus, so sage es uns freiheraus!

25 Jesus antwortete ihnen: Ich habe es euch gesagt, und ihr glaubt nicht. Die Werke, die ich tue im Namen meines Vaters, diese geben Zeugnis von mir;

13 Ew direve, ji ber ku ew bi heqdest e û bona mîhan xem nake.

14 Ez şivanê qenc im û ez yên xwe nas dikim.

15 Çawa Bav min nas dike û ez jî Bav nas dikim, yên min jî ûsa min nas dikin û ez ji bo mîhan canê xwe didim.

16 Û hin mîhên min ê din jî hene, ew daxilê vê hewşê nîn in; divê ez wan jî bînim; dê ew ê dengê min bibihîzin û bibin şivanek û keriyek.

17 Ji ber vê yekê Bav ji min hez dike, ji ber ku ez canê xwe didim, da ku, ez wî dîsa bigirim.

18 Tu kes nikare wî ji min bigire; lê belê ez wî bi xwe û xwe didim. Ji bo dayîna wî qudreta min heye û ji bo dîsa girtina wî qudreta min heye. Min vî emrî ji Bavê xwe ve girt.

19 Ji ber van gotinan dîsa di nav Cihûdan de cudayî çêbû.

20 Û di nav wan de gellekan gotin: Di wî de cin heye, ew dîn e; ma hûn çima wî guhdarî dikin?

21 Hinên din gotin: Ev gotinên hanê, yên mirovê cindar nîn in. Ma cin dikare ku çavê koran veke?

22 Di wê demê de li Orşelîmê, bo bîranîna vebûna Perestgehê cejn hebû û zivistan bû.

23 Û Îsa di hundirê Perestgehê de, di eywana Silêman de digeriya.

24 Û Cihûdan dora wî girtin û ji wî re gotin: Ma tuyê heta kengê dilê me di şikê de bihêlî? Ger tu Mesîh î, ji me re bi eşkereyî bibêje!

25 Îsa bersiv da wan: Min ji we re got û hûn bawer nakin. Xebatên ku min bi navê Bavê xwe kirin, ew ji bo min şahdeyiyê dikin.

26 aber ihr glaubt nicht, denn ihr seid nicht von meinen Schafen, wie ich euch gesagt habe.

27 Meine Schafe hören meine Stimme, und ich kenne sie, und sie folgen mir nach;

28 und ich gebe ihnen ewiges Leben, und sie werden in Ewigkeit nicht verlorengehen, und niemand wird sie aus meiner Hand reißen.

29 Mein Vater, der sie mir gegeben hat, ist größer als alle, und niemand kann sie aus der Hand meines Vaters reißen.

30 Ich und der Vater sind eins.

Unglaube und Widerstand gegen den Sohn Gottes

31 Da hoben die Juden wiederum Steine auf, um ihn zu steinigen.

32 Jesus antwortete ihnen: Viele gute Werke habe ich euch gezeigt von meinem Vater; um welches dieser Werke willen wollt ihr mich steinigen?

33 Die Juden antworteten ihm und sprachen: Nicht wegen eines guten Werkes wollen wir dich steinigen, sondern wegen Gotteslästerung, und zwar weil du, der du ein Mensch bist, dich selbst zu Gott machst!

34 Jesus antwortete ihnen: Steht nicht in eurem Gesetz geschrieben: »Ich habe gesagt: Ihr seid Götter«?

35 Wenn es diejenigen Götter nennt, an die das Wort Gottes erging – und die Schrift kann doch nicht außer Kraft gesetzt werden –,

36 wieso sagt ihr dann zu dem, den der Vater geheiligt und in die Welt gesandt hat: Du lästerst!, weil ich gesagt habe: Ich bin Gottes Sohn?

37 Wenn ich nicht die Werke meines Vaters tue, so glaubt mir nicht!

26 Lê belê hûn bawer nakin; ji ber ku hûn ne ji mîhên min in.

27 Mîhên min dengê min dibihîzin û ez jî wan nas dikim û ew li pey min tên

28 û ez jiyana abadîn didim wan û ew abadîn helaq nabin û tu kes nikare wan ji destê min derxîne.

29 Bavê min, yê ku ew dane min, ji hemûyan mezin-tir e û hêza tu kesî nikare wan ji destê Bav derxîne.

30 Ez û Bav yek in.

Bêbawerî û berxwedan zêde dibe

31 Cihûdan dîsa ji erdê kevir rakirin û xwestin ku wî bidin ber keviran.

32 Îsa bersiv da wan: Min ji Bav gellek xebatên qenc, nîşanî we dan; ma hûn ji bo kîjan xebatê min kevir dikin?

33 Cihûdan bersivê dan wî û gotin: Em ne bona xebatekî qenc, bona ku te kufrê kiriye, tu jî mirov î, lê belê tu dibêjî ku ez Xwedê me; te didin ber keviran.

34 Îsa bersiv da wan: Ma di zagona we de nehatiye nivîsandin; min got: Hûn îlah in?

35 Xwedê gotina xwe ji kê re şandiye, ji wan re îlah tê gotin û Nivîsa Pîroz jî xerab nabe.

36 Bav min pîroz kir û şand dinê. Wê çaxê bona ku min got: Ez Lawê Xwedê me, hûn çawa ji min re dibêjin ku te kufrê kir?

37 Ger ez xebata Bavê xwe nekim, baweriyê bi min neynin.

38 Tue ich sie aber, so glaubt doch den Werken, wenn ihr auch mir nicht glaubt, damit ihr erkennt und glaubt, dass der Vater in mir ist und ich in ihm!

39 Da suchten sie ihn wiederum zu ergreifen; doch er entging ihren Händen.

40 Und er zog wieder jenseits des Jordan an den Ort, wo Johannes zuerst getauft hatte, und blieb dort.

41 Und viele kamen zu ihm und sprachen: Johannes hat zwar kein Zeichen getan; aber alles, was Johannes von diesem gesagt hat, ist wahr!

42 Und es glaubten dort viele an ihn.

Die Auferweckung des Lazarus

11 Es war aber einer krank, Lazarus von Bethanien aus dem Dorf der Maria und ihrer Schwester Martha, 2 nämlich der Maria, die den Herrn gesalbt und seine Füße mit ihren Haaren getrocknet hat; deren Bruder Lazarus war krank.

3 Da sandten die Schwestern zu ihm und ließen ihm sagen: Herr, siehe, der, den du lieb hast, ist krank!

4 Als Jesus es hörte, sprach er: Diese Krankheit ist nicht zum Tode, sondern zur Verherrlichung Gottes, damit der Sohn Gottes dadurch verherrlicht wird!

5 Jesus aber liebte Martha und ihre Schwester und Lazarus.

6 Als er nun hörte, dass jener krank sei, blieb er noch zwei Tage an dem Ort, wo er war.

7 Dann erst sagte er zu den Jüngern: Lasst uns wieder nach Judäa ziehen!

8 Die Jünger antworteten ihm: Rabbi, eben noch wollten dich die Juden steinigen, und du begibst dich wieder dorthin?

38 Lê belê ger ez dikim û hûn naxwazin, baweriyê bi min bînin, balê baweriyê bi xebatên ku ez dikim bînin, da ku, hûn bizanibin û fêhm bikin ku Bav di min de ye û ez jî di Bav de me!

39 Wan dîsa xwestin ku wî bigirin, lê belê ew ji destê wan derket.

40 Îsa dîsa çû wêdatira Urdunê, cîhê ku Yehya berê li wir vaftîz dikir û li wê derê ma.

41 Pirr kes hatin cem wî û gotin: Bi rastî Yehya qet mûcîzetan çênekir; lê belê tiştên ku Yehya ji bo wî got, ew hemû rast derketin!

42 Û li wê derê pirr kesî bawerî bi wî anîn!

Mirin û vejandina Lazar

11 Li Beytanyayê, ji gundê Meryem û xwuşka wê Martayê, zilamek bi navê Lazar nexweş ketibû. 2 Lazarê nexweş, birayê Meryema ku, rûnê bêhn-xweş di Xudan de dabû û bi porê xwe jî lingê wî paqij kiribû bû.

3 Wê demê herdu xwuşkan, agahiyê ji Îsa re şandin û gotin: Ya Xudan, a vay, yê ku tu jê hez dikî, nexweş e!

4 Dema Îsa vêya bihîst, got: Ev nexweşiya ne ji bo mirinê ye; lê belê bona ku Lawê Xwedê bi vêya bête bilind kirin, ji bo bilindahiya Xwedê ye!

5 Îsa ji Marta, ji xwuşka wê Meryem û ji birayê wan Lazar hez dikir.

6 Û gava wî bihîst ku ew nexweş e, hîn du rojên din li cîhê ku ew lê bû, ma.

7 Pişt re ji şagirtên xwe re got: Em dîsa herin Cihûstanê!

8 Şagirtan ji wî re gotin: Rebbî, niha Cihûdan bona ku te bidin ber keviran dibiliyan; ma tu dîsa biçî wê derê?

9 Jesus erwiderte: Hat der Tag nicht zwölf Stunden? Wenn jemand bei Tag wandelt, so stößt er nicht an, denn er sieht das Licht dieser Welt.

10 Wenn aber jemand bei Nacht wandelt, so stößt er an, weil das Licht nicht in ihm ist.

11 Dies sprach er, und danach sagte er zu ihnen: Unser Freund Lazarus ist eingeschlafen; aber ich gehe hin, um ihn aufzuwecken.

12 Da sprachen seine Jünger: Herr, wenn er eingeschlafen ist, so wird er gesund werden!

13 Jesus aber hatte von seinem Tod geredet; sie dagegen meinten, er rede vom natürlichen Schlaf.

14 Daraufhin nun sagte es ihnen Jesus freiheraus: Lazarus ist gestorben;

15 und ich bin froh um euretwillen, dass ich nicht dort gewesen bin, damit ihr glaubt. Doch lasst uns zu ihm gehen!

16 Da sprach Thomas, der Zwilling genannt wird, zu den Mitjüngern: Lasst uns auch hingehen, damit wir mit ihm sterben!

17 Als nun Jesus hinkam, fand er ihn schon vier Tage im Grab liegend.

18 Bethanien aber war nahe bei Jerusalem, ungefähr 15 Stadien weit entfernt;

19 und viele von den Juden waren zu denen um Martha und Maria hinzugekommen, um sie wegen ihres Bruders zu trösten.

20 Als Martha nun hörte, dass Jesus komme, lief sie ihm entgegen; Maria aber blieb im Haus sitzen.

21 Da sprach Martha zu Jesus: Herr, wenn du hier gewesen wärest, mein Bruder wäre nicht gestorben!

22 Doch auch jetzt weiß ich: Was immer du von Gott erbitten wirst, das wird Gott dir geben.

9 Îsa bersivê da: Ma rojek ne donzdeh saet e? Ger mirov rojê bigere, tilpekî nabe; ji ber ku ronahiya vê dinê dibîne.

10 Lê belê yê ku şevê bigere, tilpekî dibe; ji ber ku ronahî di wî de nîne.

11 Piştî vê axaftinê, wî ji wan re got: Hevalê me Lazar bi xew ve çûye; lê belê ez diçim ku wî hişyar bikim.

12 Şagirtan ji wî re gotin: Ya Xudan, ger ew bi xew ve çûbe, dê baş bibe!

13 Îsa vêya ji bo mirina wî gotibû, lê belê wan gotin ku, qey ew ji bo xew de çûnê dibêje.

14 Wê çaxê Îsa ji wan re bi eşkereyî got: Lazar miriye.

15 Û bona ku hûn bawer bikin, ji bo we kêfxweş im ku, ez ne li wê derê bûm. Lê belê bihêlin em biçin cem wî!

16 Şagirt Tûmas, yê ku jê re digotin: Cot, ji hevalên xwe re got: Em jî bona ku, bi wî re bimirin; biçin!

17 Dema Îsa gîhaşt wê derê; Lazar çar roj e di gorê de raketî dît.

18 Û Beytanya qasî avêtina panzdeh tîrî nêzikî Orşelîmê bû.

19 Gellekan ji Cihûdan ji bo ku bona birayên wan xemrevîniyê li wan bikin hatibûn cem Marta û Meryemê.

20 Dema ku Marta hatina Îsa bihîst, bona pêrgîniya wî derket; lê belê Meryem li malê rûniştibû.

21 Marta ji Îsa re got: Ya Xudan, ger tu li vir bûya, birayê min nedimir!

22 Ez niha jî dizanim ku, tu ji Xwedê çî bixwazî, ew ê bide te.

23 Jesus spricht zu ihr: Dein Bruder wird auferstehen!

24 Martha spricht zu ihm: Ich weiß, dass er auferstehen wird in der Auferstehung am letzten Tag.

25 Jesus spricht zu ihr: Ich bin die Auferstehung und das Leben. Wer an mich glaubt, wird leben, auch wenn er stirbt;

26 und jeder, der lebt und an mich glaubt, wird in Ewigkeit nicht sterben. Glaubst du das?

27 Sie spricht zu ihm: Ja, Herr! Ich glaube, dass du der Christus bist, der Sohn Gottes, der in die Welt kommen soll.

28 Und als sie das gesagt hatte, ging sie fort und rief heimlich ihre Schwester Maria und sprach: Der Meister ist da und ruft dich!

29 Als diese es hörte, stand sie schnell auf und begab sich zu ihm.

30 Jesus war aber noch nicht in das Dorf gekommen, sondern befand sich an dem Ort, wo Martha ihm begegnet war.

31 Als nun die Juden, die bei ihr im Haus waren und sie trösteten, sahen, dass Maria so schnell aufstand und hinausging, folgten sie ihr nach und sprachen: Sie geht zum Grab, um dort zu weinen.

32 Als aber Maria dorthin kam, wo Jesus war, und ihn sah, fiel sie zu seinen Füßen nieder und sprach zu ihm: Herr, wenn du hier gewesen wärest, mein Bruder wäre nicht gestorben!

33 Als nun Jesus sah, wie sie weinte, und wie die Juden, die mit ihr gekommen waren, weinten, seufzte er im Geist und wurde bewegt

34 und sprach: Wo habt ihr ihn hingelegt? Sie sprechen zu ihm: Herr, komm und sieh!

35 Jesus weinte.

36 Da sagten die Juden: Seht, wie hatte er ihn so lieb!

23 Îsa ji wê re got: Dê birayê te biveje!

24 Martayê jê re got: Ez dizanim ku, di roja dawiyê de, dê di vejînê de biveje.

25 Îsa ji wê re got: Vejîn û jîyan ez im; yê ku baweriyê bi min bîne, ew bimire jî dê dîsa bijî

26 û her kesê ku dijî û baweriyê bi min tîne, abadîn namire. Tu baweriyê bi vêya tîni?

27 Wê ji wî re got: Belê, ya Xudan; min bawerî anî ku tu Lawê Xwedê yê ku were dinê, Mesîh î.

28 Û piştî ku wê vêya got, çû û bi dizîka bangî xwuşka xwe Meryemê kir û got: Mamoste li vê derê ye û bangî te dike!

29 Dema wê vêya bihîst, zû rabû û çû cem Îsa.

30 Îsa hîn negîhaştibû gund û hîn li cîhê ku, Marta pêrgîniyê jê re kiriye, sekinîbû.

31 Cihûdên ku tevî wê di malê de bûn û xemrevînî li wê dikirin, dema dîtî ku Meryem bi lezî derket derve; wan gotin ew diçe ser gora birayê xwe û dê li wir bigirî û li pey wê çûn.

32 Lê belê gava Meryem gîhaşt cîhê ku Îsa lê sekinîye, wî dît û xwe avêt lingê wî û got: Ya Xudan, ger tu li vir bûya, birayê min nedimir!

33 Dema Îsa, wê û ew Cihûdên bi wê re hatine digirîn, dît, di ruhê xwe de naliya û dilê wî zehf xemgîn bû

34 û got: We wî kirin ku derê? Wan ji wî re gotin: Ya Xudan, were û bibîne!

35 Îsa giriya.

36 Cihûdan gotin: Binihêre, çiqasî jê hez dikir!

37 Etliche von ihnen aber sprachen: Konnte der, welcher dem Blinden die Augen geöffnet hat, nicht dafür sorgen, dass auch dieser nicht gestorben wäre?

38 Jesus nun, indem er wieder bei sich selbst seufzte, kam zum Grab. Es war aber eine Höhle, und ein Stein lag darauf.

39 Jesus spricht: Hebt den Stein weg! Martha, die Schwester des Verstorbenen, spricht zu ihm: Herr, er riecht schon, denn er ist schon vier Tage hier!

40 Jesus spricht zu ihr: Habe ich dir nicht gesagt: Wenn du glaubst, wirst du die Herrlichkeit Gottes sehen?

41 Da hoben sie den Stein weg, wo der Verstorbene lag. Jesus aber hob die Augen empor und sprach: Vater, ich danke dir, dass du mich erhört hast.

42 Ich aber weiß, dass du mich allezeit erhörst; doch um der umstehenden Menge willen habe ich es gesagt, damit sie glauben, dass du mich gesandt hast.

43 Und als er dies gesagt hatte, rief er mit lauter Stimme: Lazarus, komm heraus!

44 Und der Verstorbene kam heraus, an Händen und Füßen mit Grabtüchern umwickelt und sein Angesicht mit einem Schweiß Tuch umhüllt. Jesus spricht zu ihnen: Bindet ihn los und lasst ihn gehen!

45 Viele nun von den Juden, die zu Maria gekommen waren und sahen, was Jesus getan hatte, glaubten an ihn.

46 Etliche aber von ihnen gingen zu den Pharisäern und sagten ihnen, was Jesus getan hatte.

Der Mordplan des Hohen Rates

47 Da versammelten die obersten Priester und die Pharisäer den Hohen Rat und sprachen: Was sollen wir tun? Denn dieser Mensch tut viele Zeichen!

37 Lê belê ji wan hin kesan gotin: Yê ku çavên koran vekiriye, ma nikarîbû tişteki bike ku, ev mirova jî nemire?

38 Wê demê Îsa dîsa di hundirê xwe de kûr naliya û hate gorê. Ew şikeftek bû û kevirekî danîbûn ber wê.

39 Îsa got: Kevir rakin! Martaya xwuşka yê mirî, ji wî re got: Ya Xudan, êdî bêhn ketiye wî, ji ber, ew çar roj e ku li vir e!

40 Îsa ji wê re got: Ma qey min ji te re negot: Ger ku tu bawer bikî, tuyê bilindahiya Xwedê bibînî?

41 Li ser vê yekê wan kevir rakirin. Îsa jî çavên xwe ber ve jor rakir û got: Ya Bavo, bona ku te min bihîst, ez ji te re şikir dikim.

42 Û ez dizanim ku tu her dem min dibihîzî; lê belê min vêya bona van mirovê li vê derê ne got, da ku, bila ew baweriyê bînin, te min şandiye.

43 Piştî ku wî vêya got, bi dengê bilind: Lazar were derve! qêriya.

44 Mirî jî, dest û lingên wî bi potikan ve pêçandî û rûyê wî bi destmalê ve girtî derket derve. Îsa ji wan re got: Wî vekin û berdin bila here!

45 Wê demê ew Cihûdên ku hatibûn cem Mer-yemê, gava xebata ku Îsa çêkir, dîtin, ji wan gellekan bawerî bi wî anîn.

46 Lê belê ji wan hinekan çûn cem Fêrisiyan û karên ku Îsa çêkirine, ji wan re gotin.

Civata Netewî bona kuştina Îsa dixebite

47 Li ser vê yekê serokên kahînan û Fêrisiyan Civata Netewî civandin û gotin: Ma em çi bikin? Ji ber ku ev mirov pîrr mûcîzeyan çêdike!

48 Wenn wir ihn so fortfahren lassen, werden alle an ihn glauben; und dann kommen die Römer und nehmen uns das Land und das Volk weg!

49 Einer aber von ihnen, Kajaphas, der in jenem Jahr Hoherpriester war, sprach zu ihnen: Ihr erkennt überhaupt nichts,

50 und ihr bedenkt nicht, dass es für uns besser ist, dass *ein* Mensch für das Volk stirbt, als dass das ganze Volk zugrunde geht!

51 Dies redete er aber nicht aus sich selbst; sondern weil er in jenem Jahr Hoherpriester war, weissagte er; denn Jesus sollte für das Volk sterben,

52 und nicht für das Volk allein, sondern auch, um die zerstreuten Kinder Gottes in eins zusammenzubringen.

53 Von jenem Tag an beratschlagten sie nun miteinander, um ihn zu töten.

54 Darum ging Jesus nicht mehr öffentlich unter den Juden umher, sondern zog von dort weg in die Gegend nahe bei der Wüste, in eine Stadt namens Ephraim, und hielt sich dort auf mit seinen Jüngern.

55 Es war aber das Passah der Juden nahe. Und viele aus dem ganzen Land gingen vor dem Passah nach Jerusalem hinauf, um sich zu reinigen.

56 Da suchten sie Jesus und sprachen zueinander, als sie im Tempel standen: Was meint ihr, kommt er nicht zu dem Fest?

57 Sowohl die obersten Priester als auch die Pharisäer hatten aber einen Befehl gegeben, dass, wenn jemand wisse, wo er sei, er es anzeigen solle, damit sie ihn ergreifen könnten.

48 Ger em wî wusa bihêlin, dê her kes baweriyê bi wî bînin û Romayî jî dê werin him cîhê me û him jî gelê me ji navendê rakin!

49 Û yekî ji wan, Serokkahînê wê salê Qayafa, ji wan re got: Hûn qet tiştêkî fêhm nakin

50 û hûn nafikirin, bona ku hemûya welat tune nebe, mirovek di oxra gel de bimire, ji bo me çêtir e!

51 Wî vêya bi serê xwe negot; lê belê ji bo ku wê salê ew Serokkahîn bû, peyxambertî kiribû ku dê Îsa ji bo gel bimire

52 û ne tenê ji bo gel, lê belê ji bo yekîtî û civandina hemû zarokên Xwedê yên ku belav bûne jî.

53 Û ji wê rojê pê ve, bona ku wî bikujin, dest bi ava kirina duzenê kirin.

54 Ji bo vê yekê êdî Îsa di nav Cihûdan de bi eşkereyî negeriya; lê ew ji wir veqetiya û çû nêzîkî çolê, navçeya ku jê re dibêjin Efraîm û tevî şagirtên xwe li wê derê ma.

55 Fisiha Cihûdan nêzîk bû. Û ji hemûya welêt gellek kes, ji bona xwe safî bikin, berî Fisihê hilkişiyar Orşelîmê.

56 Ew li wê derê, li Îsa digeriyan û dema ew di Perestgehê de sekinî bûn, ji hev û din re digotin: Hûn çi dibêjin? Gelo dê ew neyê cejnê?

57 Serokên kahînan bi Fêrisiyan re bona ku bi wî bigirin, bi gotina; ger kesek bizanibe ew li ku derê ye bila nîşan bide, emirek dabûn.

Maria salbt die Füße Jesu

12 Sechs Tage vor dem Passah kam Jesus dann nach Bethanien, wo Lazarus war, der tot gewesen war und den er aus den Toten auferweckt hatte.

2 Sie machten ihm nun dort ein Gastmahl, und Martha diente. Lazarus aber war einer von denen, die mit ihm zu Tisch saßen.

3 Da nahm Maria ein Pfund echten, köstlichen Narden-salböls, salbte Jesus die Füße und trocknete seine Füße mit ihren Haaren; das Haus aber wurde erfüllt vom Geruch des Salböls.

4 Da spricht Judas, Simons Sohn, der Ischariot, einer seiner Jünger, der ihn danach verriet:

5 Warum hat man dieses Salböl nicht für 300 Denare verkauft und es den Armen gegeben?

6 Das sagte er aber nicht, weil er sich um die Armen kümmerte, sondern weil er ein Dieb war und den Beutel hatte und trug, was eingelegt wurde.

7 Da sprach Jesus: Lass sie! Dies hat sie für den Tag meines Begräbnisses aufbewahrt.

8 Denn die Armen habt ihr allezeit bei euch; mich aber habt ihr nicht allezeit.

9 Es erfuhr nun eine große Menge der Juden, dass er dort war; und sie kamen nicht allein um Jesu willen, sondern auch um Lazarus zu sehen, den er aus den Toten auferweckt hatte.

10 Da beschlossen die obersten Priester, auch Lazarus zu töten,

11 denn seinetwegen gingen viele Juden hin und glaubten an Jesus.

Wekoka dilsoziya rasteqîn

12 Şeş roj berî Fisihê, Îsa hat Beytanyayê, Lazarê ku wî ji nav miriyan vejandî bû li wir bû.

2 Li wê derê ji bo wî ziyafetek çêkirin; Martayê jî xizmetê dikir. Yên ku bi Îsa re li sifrê rûniştibûn yek ji wan Lazar bû.

3 Meryemê nîv lîtir rûnê pirr biqîmet, ji rûnê nardînê yê safî anî û di lingê Îsa de da û bi porê xwe lingê wî paqij kir; ew mal bi bêhna rûn ve tijî bû.

4 Lê belê şagirtêk ji şagirtan, yê ku dê paşê Îsa bide dest, Cihûdayê Îsxeryotî got:

5 Ma çima ev rûn bi sê sed dînarî nehat firotin û nedan feqîran?

6 Vêya jî ne ji bo ku feqîran bi ser re digire; lê bona ku diz bû û bona kîsik bi wî re bû û yê ku di hundirê wê de ye didiziya, got.

7 Wê demê Îsa got: Dev ji wê berde! Bila vêya bo roja ku min dikin gorê hilîne.

8 Ji ber ku feqîr her dem bi we re ne, lê belê ez her dem ne bi we re me.

9 Ajaweyeke mezin ya ji Cihûdan, bihîstin ku Îsa li wê derê ye û tenê ne ji bo Îsa, lê ji bo Lazarê ku wî ji mirinê ve rakiribû jî bibînin hatin.

10 Serokên kahînan di nav hev de şewira kuştina Lazar jî kirin;

11 Ji ber ku bona wî pirr Cihûd diçûn û bawerî bi Îsa dianîn.

Der Einzug des Messias Jesus in Jerusalem

12 Am folgenden Tag, als viele Leute, die zum Fest erschienen waren, hörten, dass Jesus nach Jerusalem komme,

13 da nahmen sie Palmzweige und gingen hinaus, ihm entgegen, und riefen: Hosianna! Gepriesen sei der, welcher kommt im Namen des Herrn, der König von Israel!

14 Jesus aber hatte einen jungen Esel gefunden und setzte sich darauf, wie geschrieben steht:

15 »Fürchte dich nicht, Tochter Zion! Siehe, dein König kommt, sitzend auf dem Füllen einer Eselin«.

16 Dies verstanden aber seine Jünger anfangs nicht, doch als Jesus verherrlicht war, da erinnerten sie sich, dass dies von ihm geschrieben stand und dass sie ihm dies getan hatten.

17 Die Menge nun, die bei ihm war, als er Lazarus aus dem Grab gerufen und ihn aus den Toten auferweckt hatte, legte Zeugnis ab.

18 Darum ging ihm auch die Volksmenge entgegen, weil sie gehört hatte, dass er dieses Zeichen getan hatte.

19 Da sprachen die Pharisäer zueinander: Ihr seht, dass ihr nichts ausrichtet. Siehe, alle Welt läuft ihm nach!

20 Es waren aber etliche Griechen unter denen, die hinaufkamen, um während des Festes anzubeten.

21 Diese gingen zu Philippus, der aus Bethsaida in Galiläa war, baten ihn und sprachen: Herr, wir möchten gerne Jesus sehen!

22 Philippus kommt und sagt es dem Andreas, und Andreas und Philippus sagen es wiederum Jesus.

Îsa diçe Orşelîmê

12 Dotira rojê, ajaweyeke mezin yên hatibûn cejnê, dema hatina Îsa ya Orşelîmê bihîstin;

13 guliyê xurme rahiştin û bona pêrgîniya wî çûn û qêriyan: Hozana! Yê ku bi navê Xudan tê, Qiralê Îsraêlê pîroz be!

14 Îsa, dehşikek dît û lê siwar bû; mîna ku hatiye nivîsandin:

15 Metirse, ya keça Siyonê! A vay, Qiralê te li dehşikekê kerê siwar bûye û tê.

16 Şagirtên wî di destpêkê de van tiştan fêhm nekirin; lê belê wexta ku Îsa hat bilind kirin, wan vê yekê anîn bîra xwe ku ew tişt ji bo wî hatine nivîsandin û wan vêya ji bo wî çêkirin.

17 Ew gelê ku dema wî bangî Lazar kir û ew ji mirinê rakir li wê, li cem wî bûn, wan şahdeyiyê dikir.

18 Ji ber vê yekê gel jî berbi wî ve çû; ji ber, wan bihîstibû ku wî vê nîşanê çêkiriye.

19 Ji bo vê yekê Fêrisiyan ji hev û din re gotin: Hûn dibînin; ji destê we qet tişteyê nayê; a vay, hemûya dinê li pey wî diçe!

20 Di cejnê de, di nav yên ku bo peristinê hilkişiyabûn Orşelîmê de, hin kesên Grekî jî hebûn.

21 Vana hatin cem Fîlîpûs, ew ji Beytsaydaya ku bajarê Celîlê ye, bû, ji wî rica kirin û gotin: Efendî, em dixwazin ku Îsa bibînin!

22 Fîlîpûs hat û ji Andrêyas re got; Andrêyas û Fîlîpûs jî hatin û ji Îsa re gotin.

*Der Messias kündigt seinen Opfertod
und seine Verherrlichung an*

23 Jesus aber antwortete ihnen und sprach: Die Stunde ist gekommen, dass der Sohn des Menschen verherrlicht werde!

24 Wahrlich, wahrlich, ich sage euch: Wenn das Weizenkorn nicht in die Erde fällt und stirbt, so bleibt es allein; wenn es aber stirbt, so bringt es viel Frucht.

25 Wer sein Leben liebt, der wird es verlieren; wer aber sein Leben in dieser Welt hasst, wird es zum ewigen Leben bewahren.

26 Wenn jemand mir dienen will, so folge er mir nach; und wo ich bin, da soll auch mein Diener sein; und wenn jemand mir dient, so wird ihn [mein] Vater ehren.

27 Jetzt ist meine Seele erschüttert. Und was soll ich sagen? Vater, hilf mir aus dieser Stunde! Doch darum bin ich in diese Stunde gekommen.

28 Vater, verherrliche deinen Namen! Da kam eine Stimme vom Himmel: Ich habe ihn verherrlicht und will ihn wiederum verherrlichen!

29 Die Menge nun, die dabeistand und dies hörte, sagte, es habe gedonnert. Andere sagten: Ein Engel hat mit ihm geredet!

30 Jesus antwortete und sprach: Nicht um meinetwillen ist diese Stimme geschehen, sondern um euretwillen.

31 Jetzt ergeht ein Gericht über diese Welt. Nun wird der Fürst dieser Welt hinausgeworfen werden;

32 und ich, wenn ich von der Erde erhöht bin, werde alle zu mir ziehen.

33 Das sagte er aber, um anzudeuten, durch welchen Tod er sterben würde.

34 Die Menge antwortete ihm: Wir haben aus dem

Îsa Mesîh daxuyaniya mirina xwe dike

23 Îsa bersiv da wan û got: Saeta ku Lawê Mirov bête bilind kirin hat!

24 Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Heta ku tena genim nekeve nav erdê û nemire, ew ê tena serê xwe bimîne; lê belê ger bimire, dê gellek zad bide.

25 Yê ku ji canê xwe hez bike, wî winda dike; lê belê yê ku di vê dinê de ji canê xwe dikerihe, wê ji bo jiyana abadîn hiltîne.

26 Ger kesek bixwaze xizmetê ji min re bike, bila li pey min were; ez li ku derê bim, dê xizmetkarê min jî li wê derê be; ger kesek ji min re xizmetê bike, dê Bav rûmetê bide wî.

27 Niha canê min zehf teng dibe û ma ez çi bibêjim? Bibêjim, Bavo, min ji vê saetê xelas bike? Lê belê ez ji bo vê yekê hatime vê saetê.

28 Bavo; navê xwe bilind bike! Li ser vê yekê ji jor ve dengê hat: Min ew bilind kir û ez ê wî dîsa bilind bikim!

29 Ew gelê ku li wê derê bûn û ajaweya ku vêya bihîstin, digotin: Ezman guregur kir. Hinekan jî digotin: Milyaketekê pê re axifi!

30 Îsa bersiv da û got: Ev denga ne ji bo min, lê ji bo we hat.

31 Daraziya vê dinê niha ye. Dê serokê vê dinê niha bête avêtinî derve.

32 Û dema ku ez ji erdê ve bilind bibim, ez ê hemû kesî berbi xwe ve bikişînim.

33 Îsa vêya ji bo ka ew ê bi mirinek çawa bimire got.

34 Ajaweyê bersivê da wî: Me ji zagonê ve bi gotina,

Gesetz gehört, dass der Christus in Ewigkeit bleibt; wie sagst du denn, der Sohn des Menschen müsse erhöht werden? Wer ist dieser Sohn des Menschen?

35 Da sprach Jesus zu ihnen: Noch eine kleine Zeit ist das Licht bei euch. Wandelt, solange ihr das Licht noch habt, damit euch die Finsternis nicht überfällt! Denn wer in der Finsternis wandelt, weiß nicht, wohin er geht.

